




Têkoşîna neteweyî ya gelê Kurd li bajarên Tirkiyê jî hêza xwe bilind û fireh dike. Bi tesîra pêla vê têkoşînê:

Gelê Tirk jî bi ser xwe ve tê

- Ji beriya 12'ê Îlona 1980'yan ve, yekemîn car li Stenbolê zêdeyî sed hezar mirovên pêşverû bi hev re bi sloganên li dijî faşizmê meşiyên. Qetliamên ku hêzên dewletê û faşistan li Sêwazê pêk anîn, gelên Kurd û Tirk bi hev re li bajarên Kurdistanê û yên Tirkiyê bi awayên cur be cur protesto kirin. Li gelek deverên Kurdistanê kepeng hatin girtin. Li Edenê, Mêrsîn, Enqerê û Stenbolê jî girsên gel meşiyên.
- Di dema meşên protestoyan de sloganên şoreşgerî hatin avêtin. Gelê Tirk ê ku heta vêga dengê xwe zêde li dijî dewletê dernedixist, ji qetliama Sêwazê û vir ve hêrsa xwe li dijî dewleta Tirk bi dengê bilind diyar kirin. Di van meşan de sloganên herî balkêş û girîng "Emê gazî gerîla bikin da ku were Sêwazê", bû. Sloganên wiha nîşan didin ku hêviya gelê Tirk jî, gerîla ye.

Rûpel 8



Piştî 12'ê Îlonê, ev cara pêşî ye ku li bajarên Tirkiyê, bi taybetî jî li Stenbolê, bi awayekî wisa geş û gurr ji sedhezar zêdetir mirovên pêşverû bi sloganên şoreşgerî li dijî qetliamên dewletê û yên faşistan, dimeşin û dilxwaziya xwe ji bo biratiya gelan û sistemeke sosyalîst finin ziman.

Ferqa wan zimanê wan e

Ger dijminê yekî hebe, ne rovî bila şêr be. Wê demê şêrê li hember wî jî hêsan e. Lê çî mixabin dijminên gelê Kurd ne şêr in, hemû jî dilgamar û pilêp in. Ne tenê dilgamar û pilêp in; hov in, bêbext in, zordar in, kedxwar in û xwînrêj in. Ji mirovatî û mafên mirovan fêm nakî. Bawerî bi wan nayê ku mirov ji bo peymanan bi wan re rûnê. Lewre ji kuştina mirovan hez dikin, di mejiyê wan de kotekî, zordarî û xwînrêjî rûniştîye. Tore û qanûnên wan li ser zordarî, kedxwarî û xwînrêjiyê hatine damezirandin. Jiyaña wan li ser talan, sirgûn, stem, zilm, kedxwarî û qetilxwîne hatiye avakirin.

Dîroka wan bi xwîna gelên bindest û mêtîngê hatiye nivîsîn.

Ne Tirk bi tenê; tu ferqa Tirk, Erebi û Eceman nîn e. Ji xeynî zimanê wan, Ma çî ferq di navbera qetlîamên Dêrsim, Zîlan, Diyarbekir, Agirî, Mehabad, Berzan, Helebçe, Şirnex û Cizîrê de hene? Ma çî ferqa Mistefa Kemal, Sedam û Xomeynî heye, ji xeynî dema serokatiya wan.

Dewran e... Pêr li bakurê Kurdistanê, do li başûrê Kurdistanê îro li rojhilatê Kurdistanê. Ji hev hîn dibin siyaseta qetlîamê. Alîkarî didin hev, sînorên xwe ji hev re vedikin ji bo kuştina Kurdan. Sînor dixine navbera

gelê Kurd û beşên Kurdistanê. Lê ew bi xwe van sînoran nanasin di riya xwînrêjiya gelê Kurd de. Do dewleta Tirk, îro jî dewleta Ecem bi top, tanq û bi balefirên xwe êriş dibin bi ser başûrê Kurdistanê ve. Beşên Kurdistanê ji leşkerên xwe re kirine riya avê.

Lê mixabin yê ku van fersendên mezin didin dijminê me jî em bi xwe ne. Ger em rê û dirbên welatê xwe ji dijminên xwe re venekin, dijminên me nikarin wilo hêsan li ser xaka welatê me cîrît biavêjin.

Ger ku dijminên me weke serê derziyê ji mirovahiyê, ji mafên mirovan û ji

demokrasiyê fêm bikirana, wê rûmet bidana şerrawestina ku PKK'ê di 20'ê Adarê de îlan kir. Wê bi vê rûmetê re cih bidana mirovahiyê û mafên mirovan ên gelê Kurd. Lê dewletê şerrawestîne weke fersendekî dît û êrişên xwe diwartir kirin.

Madem em dizanin rewşa dijminê me ev e, ji bo çî em hişê xwe neynin serê xwe. Divê em dev ji birakujiyê berdin û li hember dijminên xwe hêzên xwe bikin yek. Ji bo ku em neyên listikên dijminên xwe û ji bo em xurttir bikin tevgera şoreş, serkevtin û serfiraziya xwe.

Seyfettin Özcan

FERHENGOK

- Ambûrîn:** Hacet, alet, navgîn (araç)
Ambûr: Alet, instrument (araç, alet)
Bêparêz: Bêmuhafiz (savunmasız)
Dexil: Tebare, debir, qût (hububat)
Dijwar: Zor, xeter
Enî: Cephe, bere (cephe)
Hêmin: Aram, sebir (sabır)
Jûjî: Jîjo (kirpi)
Kan: Çavkanî, jêderk (kaynak)
Kelax: Laşê heywanan
Kemîn: Xefik, dafik (tuzak)
Kujyar: Qatil, mêrkuj, mirovkuj
Kujyarî: Qatîlî, mêrkujî, mirovkujî
Nakok: Dijber, dubend (çelişik, çelişkili, karşı)
Nakokî: Dijberî, duberî (çelişki, karşıtlık)
Noker: Xulam, xizmetkar, pakar
Nokerî: Xulamî, xizmetkarî
Pesin: Meth (övme)
Pesindar: Metihker (övgücü)
Reşekujî: Teror
Serhildêr: Asî, kesê serî hildide (başkildiran)
Serqerdan: Beredayî, serserî
Şêwe: Teşe, awa, terh
Veqetînxwaz: Cudaxwaz, cihêtîxwaz (ayrılıkçı)
Veqetînxwaz: Cudaxwazî, cihêtîxwazî (ayrılıkçılık)

Bersiv dixwazim

Berî her tiştî silavên welatparêzî û aştiyê li we rojnamevanên Welat û xwendevanên Welat dikim.

Ez xortekî panzde salî me. Min xwest nameyekê ji we re binivîsim. Hêviya min ji we ew e ku, hûn vê nameyê di rojnameya xwe de binivîsin.

Hevalên hêja min xewnek dît. Pîrr di nav hev de bû. Min tiştê fêm nekir. Daxwaza min hûn xewna min bi min bidin fêmkirin. Di xewnê de şêrê Kurdistanê hebû. Ji Ruha (Urfa) pêştir her cih gihîştibû destê Tirkan. Kurdan serê xwe hildan û Tirk ji Kurdistanê derxistin. TC digot em kimyayê biavêjin Ruhayê. Kîmyayê avêtin û gelê Ruhayê bi hev re şehîd ketin.

Pîrsa min ev e, çima Ruha bi tenê? Yanî çima kîmyayê neavêtin hemû Kurdistanê? Ku mirov bi rastî dimeyîzîne di doza Kurdîtiyê de ne Ruhayî tenê ne, wek Dêrsim, Bîlîs, Serêkaniyê, Kerboran û hwd. jî hene. Daxwaza ev e, hûn vê xewnê sere-rast bikin. Gelek spas.

Ji Kurdistanê xortekî welatparêz

Jêrenot: Di navenda rojnameya Welat de rojnamevanên ku karibin xewnan şîrove bikin nîn in, ji ber vê pîrr mixabin em xewna we bêbersiv dihêlin. Lê ger di nav xwendevanên me de yên ku dikarin vê xewnê şîrove bikin hebin, bila ji me re binivîsin.

Rojnameya Welat

Mirovên nû çiyayên bi ziman

Bi helkeftina lîxistinên PKK'ê li berjewendiyên Tirkan li Ewropa. Ji şoreşgerên bakurê Kurdistanê re diyarî dikim.

Lingên we
 Pîstalên we yên pîs
 Axa me pîs kiriyê!
 Ev ne axa pîskirinê ye
 Ev axa pîroz e, pîroz.

Hûn zimanê mirovan nizanin
 Mirina we li ser axa me ye
 Axa me
 Kelexên we yên pîs hembêz nake!
 Ev axa pîroz e, pîroz
 Maka egîdan e û
 Şehîdan xwedî dike
 Dilên me li ser wê û
 Ji bo wê xwe hildiyêjin

Hûn zimanê mirovan nizanin!
 Destên we yên pîs
 Bêhna xwîna me jê tê!
 Dilên we reş...
 Çavên we kûr...
 Bi şev mirovên me dikujin
 Bi roj hûn tîn şîr û taziya me!
 Ev çî derew in?!
 Ev çî bêbextiyê?!

Hêj ku min dest bi yazkirinê nekiriye, ez zehf (pîrr) spasiyan ji Welat dikim. Ez ji nivîskarên Welat re zor spas dikim û ez ji wan hemûyan re çiqas spas bikim hindik e. Min vê carê Welat qezetê kirî û ji we re mektûp yaz kir. Hate bîra min, min jî dest pê kir yaz kir. Belkî ez zehf Welata Kurdî bixwînim.

Ez xwe bidim naskirin. Feqe Huseyn min nas dike. Jê re wiha bibêjin: Kurê Qasimê Hacî Mihê. Min tiştê wiha divê. Xêra xwe hûn pêk binin. Ji min re kitêbek bi 8 hezaran

Hûn nema dikarin me bixapînin
 Di nav dilê zarokên me de
 Kerb û nifreta we şîr dibe!
 Genimê me...
 Dexl û danê me
 Darên me...
 Çiya û kevirên me
 Axa me û ava me
 Nifretan li we dibarînin!
 Êdî nema mirovên me
 We wek mirovan dibînin.

Em mirovên nû diafirînin
 Mirovên me nû ne, nû.
 Zarokên me ne xapînok in
 Rojên we bûrin
 Êdî nema
 Hûn bikarin me bixapînin.

Ev axa pîroz e, pîroz
 Her bosta lingên we pîs kiribe
 Em dê bi xwîna we bişon
 Tirokên ezmanê me
 Dê laşê we yê mirar birizîne.

We ewqas xwîna me rijand
 Em bûn tîniyên xwîne!
 Em tîniyên xwîne ne, tîniyên xwîne!
 Ev çî laşên mirar in?

Rakêşin,
 Ji nav axa pîroz derxin!
 Ev axa pîroz e, pîroz!

Bibihîsin dengê me!
 Ev deng dengê me ye
 Ji dengê me...
 Ji vê qîrîna me...
 Dinya diheje!
 Çiyayên me bi ziman ketin!
 Ev deng dengê me ye...
 Bibihîze çihana kerr!

Em ne mirovkuj in
 Em mirov in, mirov.
 Hûn zimanê mirovan nizanin
 Êdî nema hûn dikarin
 Xwîna me
 Ji nav dilê me bixwînin.

Welatê me dilê me ye!
 Parastin û fidakarî karê me ye.
 Ger dengê me,
 Berxwedan û xebata me
 Di çavên we û
 Çihana kor de teror be,
 Ev teror e, tac e li ser serê me ye.

Mehfûz Mayî

Ez Welat dixwînim

lazim e. Bila Kurmancî be û xwendina wê xweşî min biçê. Ez bi Tirkî, bi kesekî re mijûl nabim. Ev ji mehekê zêdetir e ku ez Welat dixwînim, gelekî li xweşa min diçe. Kê ji we dixwîne, xêra xwe kitabê ji bîr nekin.

Şiira gerîla zehf xweşê min çû û zehf jî şah bûm. Her wekî Kurdistan azad bûye. Dîsa Abdurrahman Durre re, Amed Tigrîs re, Yaşar Kaya re, Amadekar Rasto Zîlanî re û Feqe Huseyn re selamên min

bibêjin. Şahiya wan dixwazim. Zor spas ji Welat û nivîskaran re
Jêrenot: Min tiştêkî ji bîr kir, ku ez Welat dixwînim, hevalên me dibêjin sayfa sozlikê bila çinyek zêde bin ku em xwendinê zêde fêm bikin.

EM HEQ DIXWAZIN

Em gencikê welat in welatparêz re xebat in pêşkêşiya serhildan îro mane bin destan

Em heq dixwazin dewletan
 Rizgar bikin Kurdistan
 Îro hinde Kurd henin
 Çima dimînin bindestan
 Gund û mal tev talan bin
 Gundî hemû koçber bin
 Em hesabê naborin
 Xwîna Musa Anter erdê nahêlin

Musa Anter kalê me
 Pal daye çiyayê me
 Roja hesabê wê bê
 Kî ye ew dijminê me


Berzîndan Dînger

ERNK'ê koça ji Licê qedexe kir

Ji dema ku biryara şerrawestîne xerabûye, komên gerîla bi êrîşên mezin diçin ser avahiyên leşkerî yê dewletê û ew dixesirînin. Li hember van êrîşên gerîla, hêzên dewletê gundan dişewitînin û gelê sivil dikujin. Di van demê nêzik de tenê neh gundên navçeya Licê bi vî awayî hatin şewitandin û gel ji gundan koç kir. Armanca dewlete jî ew bû ku, gundan ji gel xalî bikin. Li ser vî awayî Komîteya Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistanê (ERNK) ya Licê koçkirina ji gundan qedexe kir. Di daxuyaniya xwe de ERNK'ê wiha bangî gel kir: "Koçberiya we, politîkaya dewletê bi xwe ye. Koçkirin ne çare ye, divê hûn li ber xwe bidin. Jiyana ku hûn herin li metropolan bijîn, rezîlî ye, pîstî ye. Dewleta dagirker tevî hemû neheqîya xwe ji axa we dernakeve, hûn xwediyê vê axê ne hûn çima dertên? Divê hûn heta dawiyê li ber xwe bidin." Wekî din ERNK'ê gazî gel kir ji bo ku kes alîkarî nede kesên dixwazin koç bikin û xwest ku şofêrên qamyonan jî malên wan bar nekin. Heke hê jî kesên ku dixwazin koç bikin çêbibin, divê gel silavê jî li wan venegerîne û wan tecrîd bike ku ji cih û warên xwe nerevin.

Li Erzinganê 28 kuştî

Li gundê Başbağlar a Kemalîye ku li ser Erzinganê ye êrîşeke kiryardîyar pêk hat. Gundê Başbağlar roja 5'ê Tirmehê ji aliyê grûbeke çekdar ve hat rûxandin. Di vê bûyera tarî de 28 kes ji gund hatin kuştin. Hemû avahiyên gund jî hatin şewitandin. Rayedarên dewletê jî vê êrîşê PKK'ê berpirsiyar digirin. Li gor îdiaya wan, li cihê bûyerê tu daxuyanî nekiriye dîtî û li ser belavokê îmzeyê PKK'ê û TIKKO heye. Lê PKK'ê heta niha li ser vê bûyerê tu daxuyanî nekiriye. Mebûsê Partiya Demokrasiyê (DEP) Mahmut Alınak di komcivîna xwe ya çapemeniyê de da xuyan ku li ser vê bûyerê perdeyeke qalind heye û diyar nîn e ka kê ev bûyer pêk aniye.



Roj namîne ku gundên Kurdistanê ji aliyê hêzên dewletê ve nayêne şewitandin û hilweşandin.

Muxtarên gundên şewitî li Enqerê

Navenda Nûçeyan- Neh nûnerên şeş gundên navçeya Mahsertê (Omerîyan) ku di demên celeb bi celeb de xaniyên wan ji aliyê hêzên dewletê ve hatibû şewitandin, ji bo gundî vegerin gundên xwe û hin pêwendîyan pêk bînin çûn Enqerê.

Gundiyan gundên Mahsertê yê Yestê, Rişwanê, Xirbêmetê, Kewarêxê, Xanîsora û Şexmahmût ku di dema cerda hêzên dewletê de xaniyên wan hatibûn şewitandin û hilweşandin dan xuyan ku dixwazin bizivirin gundên xwe. Gundiyan di nav xwe de jî 9 nûner bijartin. Ev nûner çûn Enqerê da ku vê daxwaziya gundiyan bi serokkomar, serokwezîr, wezîr û mebûsan bigihînin. Gundiyan jî ber pest û pêkûtiya cendirme û cerde-

vanên gundan ku bêgav mane gundên xwe bişewirînin wiha peyivîn: "Em li vir li derve man, perîşan in. Ji ber vê rewşê em dixwazin vegehin gundên xwe. Me di nav xwe de nûner hilbijartin. Ew dê daxwaziyan me bi serokkomar, serokwezîr, wezîr û mebûsan bigihînin."

Heyeta nûneran ku ji neh kesan pêk hatiye navên wan ev in: Keyayê gundê Yestê Kazim Çinar, Keyayê gundê Xanîsorê Ahmet Çelik û Hasan Çelik ji gundê Rişwanê Keya Alî Demîr û Îbrahîm Öztürk, Keyayê gundê Xirbêmetê Mehmet Yavuz, Keyayê Şexelya Şehmus Bakîş, yê gundê Kewarêxê Yusuf Turan û gundê Kaniyaşêx ku li ser navenda Mêrdîne ye H.Hasan İlhan.

Pesta polîsan li ser Gündema Wanê

Roja 4'ê Tirmehê polisên emniyeta Wanê pêşî avêtin ser buroya belavkirinê, dû re jî girtin ser nûneriya rojnameyê û ji xebatkarên buroyê Şivan Acar û xwendevanê rojnameyê bi navê Soner Bulut kirin bin çav.

Polîs piştî du rojan careke din digirin ser nûneriya rojnameya Gündemê ya Wanê. Bi xwe re jî xebatkarên ku binçav kiribûn tînin û ji wan dipirsin: "Rojname ji we re ji ku derê tîn, hûn ji ku derê distînin?"

U bi zorê dixwestin ku bibêjin rojname ji me re ji nûneriyê tîn.

Polîs ku tiştê di buroyê de nabînin bi navê dikevin û her tiştî sero bino dikin. Li ser vê bûyerê, nûnerê buroya Gündemê ya Wanê Yusuf Cacim nameyek ji Serokwezîra Tirkiyê Tansu Çiller re nivîsî.

Di nameyê de pêkûtiyên li ser buroya Özgür Gündemê ya Wanê tene protestokirin û tê xwestin ku dawî li van cerd û zordariyan werin.

Li İzmîrê 2 înfaz

Li İzmîrê 2 kes ji aliyê polîsan ve di malekê de hatin kuştin. Bûyer li Navçeya Karşiyaka pêk hat. Tê îdiakirin ku herdu kesên kuştî têkoşerên PKK'ê ne.

Roja 8'ê Tirmehê polîs, li ser îxbarê bi ser malekê ve digirin. Piştî ku polîs dor li malê digirin, têkoşer 2 zarok

û 2 jin ji malê derdixin. Dû re jî polîs dest pi gullebaranê dikin. Têkoşerên di nava malê de, nêzikî 20 deqîqeyan li ber xwe didin. Lê dawî herdu jî tene kuştin.

Polîsan, piştî vê bûyerê gelek kes girtin û binçav kirin. Navên herdu têkoşeran hê jî nayê zanîn.

HAWAR

Dilbixwîn

'Em ji we cesaretê distînin'

Di kongreya YRWK'ê de nivîskarên Welat, Rewşen, Gündem û hwd. li kêleka hev danîstibûn û li ser rewşa nivîskarî û rojnamegeriya Kurdî guftûgoyeke kûr, gotûbêjêke germ dest pê kir. Gelek pirs hatine ziman, li ser gelek babet û mijaran hate rawestandî.

Şoreş pêşve diçe, rewşenbîrên Tirkan ên nîjadperest û şovenîst cepheyek li hember me vekirine. Di mehekê de bi dehan nivîs, gotar, kovar, rojname û pirtûkan li dijî me û ji bo li paşxistina tevgera rizgariya neteweya Kurdistanê derdixîne piyaseyê. Kêliyêkê jî ranawestî, bêplan û program tenê gavekê jî navêjin. Ji serokkomarê wan heya bi zêrevanê li ber deriyê bank û restorantên wan hemû weke ku me bavê wan kuştibe, li ser bingeha qirkirina me amade ne.

Di nava wan gotûbêjên cur be cur de ez jî amade bûm. Berî kongreyê bi du rojan Kurdan li Ewropa êrîş biribûn ser konsolos, saziyên ekonomîk ên dewleta Tirk, ji bo rawestandina qirkirinan û azadiya neteweyî, pişt dabûne hev û bi livbazîyan rabûbûn. Gelo, li hemberî van livbazîyan rûmetdar û meşa azadiyê ku bi milyonan Kurdan di nav de cih gir-

Şoreş pêşve diçe, rewşenbîrên Tirkan ên nîjadperest û şovenîst cepheyek li hember me vekirine. Di mehekê de bi dehan nivîs, gotar, kovar, rojname û pirtûkan li dijî me û ji bo li paşxistina tevgera rizgariya neteweya Kurdistanê derdixîne piyaseyê. Kêliyêkê jî ranawestî, bêplan û program tenê gavekê jî navêjin.

tîne, helwest (tawir) çi ye, divê çi be?

Dema ku mesaj hatine xwendin, tevî hemûyan mesajekê bêhtir bala min kişande ser xwe, Mesaj ji Kurdistanê hatibû. Kesên şandibûn her roj di nava agirê dijmin de bûn, ha îro, ha sibê... Di her kêliyêkê de mimkûn bû dijmin biavêje ser wan û jiyane li wan qedexe bike, belê di rewşeke wisa kambax û dijwar de, hevalan di mesaja xwe de ev he-

vokên kurt û watedar rêz kiribûn: "Me pîr dixwest em di nava we hevalan de bin, lê heyf û mixabin dijmin rê neda, dîsa jî em bi dilê xwe bi we re ne (...) Em ji we hînî berpirsiyariyê dibin, ji we hînî rewşenbîriya welatparêz dibin. Bawer bikin em ji we cesaretê distînin..."

Li vir ez vê pirsê ji rewşenbîrê Kurd ê li Ewropa dikim, ku jiyana wî ji ya rewşenbîrê Ewropî gelekî baştir e: Em dikarin bibin xwediyên wê baweriyê ku hevalên me yê rewşenbîr ên li welat bi me tînin? Ji bo em bersiva wê baweriyê wana bi me bidin, me çi kiriye?

Bila şaş neyê fêmkirin, ez nabêjim tiştê nebûye, gelek tişt bûne, lê hema bersiv nehatiye dayîn, derfet (îmkan) seferber nebûne. Her yekî ji me li ser kêf û daxwaza xwe, dema dilê wî xwestiye gotarek nivîsiye, an li ser maseyêke propaganda pirtûka xwe kiriye. Bawer bikin em ne layîq in. Eger li vê meydana fireh em nikarin piştgiyariya şoreşa xwe bikin, bi pirsên bênaverok re mijûl bibin û ji rastiyê birevin û bibêjin; "Wezîfeya rewşenbîran tenê nivîsandin û axaftina di panel û konferansê de ye", ez rast nabînim. Eger şivan û gavanên Kurdan di kozikên azadiyê de egîdî û qehremaniyên matmayî biafirînin, rewşenbîrê me jî li Ewropayê newêrîbe biçe meşekê, newêrîbe di şevêkê de mesajekê bixwîne, an jî belgenameyêke protestokirina dagirkeriya dijmin li Kurdistanê îmze bike û bi hinceta "hingê Konsolosa Tirkan vîzeyê nade min" bireve, cesaret li ku dimîne.

Belkî hîna we jî bîr nekiriye, berî vê bi demekê li Viyennayê li ser pîrsa Kurdan konferansê hatibû çêkirin. Rewşenbîrên Kurd û Tirkan ên demokrat nameyêke protestokirina êrîşên dewletê li hember PKK'ê ji raya giştî re hinaribûn. Çend rewşenbîrê nameyê îmze nekiribûn. Min profesorek ji wan dît, ne pêwîst e nav were gotin. Li ser neîmzekirina xwe wiha bersiv da min: "Hûn dixwazin mala min bişewitînin..."! A cesareta mezin!



Serokwezîrê Vietnamê Vo Van Kîet careke din Kuba ziyaret kir. Têkillyên herdu welatan bi hevalbendiya germ ya Kastro û Kîet, hîn zeximtir dibe.

Serokwezîrê Vietnamê li Kubayê

Nûçeyên Derve- Serokwezîrê Vietnamê Vo Van Kîet roja sêşemê çû Kubayê, piştî serlêdana xwe ya Ewropayê. Fîdel Kastro Serokê Kubayê, bi xwe çû pergîniya Kîet, endamê Polîturoya Partiya Komunîst a Vietnamê. Serlêdana wî dê çar roj bidome.

Serokwezîr Kîet, di axaftina xwe de wiha got: "Kuba, birayê me ye û di dema şerê me yê bi Amerîkayê re ji bo me xwîna xwe rijandiye. Kuba ne bi tenê dostekî me yê kevin e. Lê belê di rîya avakirina sosyalîzmê de ji hevalê me yê sosyalîst e. Ji ber vê yekê em ne poşman in di rêka avakirina sosyalîzmê de."

Kîet bi bîr xist ku, Fîdel Kastro yekemîn serokdewletê biyanî ye ku di sala 1973'an, di dema şerê Vietnam û Amerîka de Vietnam ziyaret kiriye. Kuba û Vietnam bi xwe endamên rêxistina KOMKON'ê bûn. Li ser hilweşandina bloka sosyalîst, herdu hevalbend di binê astengiyên aborî de mabûn. Amerîka jî li hemberî herduyan ambargoya aborî dabû destpêkirin. Di gel ambargoya sivikî a li dijî Vietnamê, ya li ser Kubayê hîn bihêztir û xurttir kiribû.

Sedema ambargoya sivik a li ser Vietnamê, pest û pêkutîya dewletên Japon û Fransayê ye.

Durûtiya dewletên Rojavayê

Norwec, Welat- Hevalbendê. Norwecê Tirkîye, li Kurdistanê dest bi çalakiyê nû ya leşkerî kir. Serokkomar Demîrel û hikûmeta nû bi beyanatên xwe didin xuyan ku pîrsgirêka Kurd dê bi navgînên leşkerî bê 'çareserkerin'. Di karvaniyê de ev yek tê wateyê ku Kurdistan dê bikeve bin kontrola leşkerî.

Di meha Adarê de bi hatina Newrozê re Serokê Partiya Karêrên Kurdistanê (PKK) ji bo çekirina guftûgoyan, pêşniyarek pêşkêşî Enqereyê kir. Ji bo ku klîmayek ji bo guftûgoyan bê peydekirin. PKK'ê şerrawestîneke yekalî îlan kir. Pêşniyar jî hêla Demîrel ve di ci de hat redandin. Di şûn de artêşa Tirk dest bi çalakiyê nû kir.

Niha jî bi çekên Rojava, Tirkiye tê xurtkirin. Ji Amerîkayê helikopterên nû Black Hawk, ji Almaniyayê panzer, ji Îngilîstanê jî her celeb çek û ambûrîn tîndandin. Wezîriya Parezîyê ya Norwecê li aliyekî ketiye navgerdûnê ji bo peydakirina hêzên

aştiyê axaftinan dike, li aliyê din jî, li hember êrîşbaziya dewleta Tirk bédeng dimîne. Li şûna wê PKK, ji protestoyên xwe yên ku li dijî balyozên Tirk, ji bo ku li hember pestên dewletê bala civaka navneteweyî bikişîne pêk anîn, mora terorîzmê digire. Ji bo balkişandina civaka navneteweyî çalakiyên wilo, berê jî hêla Ermenîyan ve jî hatibûn çekirin.

Rojava jî bo çareserkerina dubendiyên Ewropayê û dinyayê behsa 'parêziya aştiyê' û 'afirandina aştiyê' dike. Ji bo bicihanîna wan jî çalakiyên nû pêwîst dibîne. Lê axaftinên wan pûç in. Ji bo durûtiya wan Kurdistan mînakeke berbiçav e. Îdeolojîya wan a berê bi ambalajên nû hatiye nuxumandin, di rastiya xwe de armanca wan wekî ya berê ye. Berjewendiyên wan, ji bo vê yekê ye ku, durûtiya wan zû derdikeve holê.

"Ev nivîsa jorîn di 03.07.93'yan de di rojnameya Klassekampen a Norwecî de ji hêla berpirsiyariya wê ve hatiye weşandin.

Berlîn de şahiya NÇM'ê

L. Jandîl

Berlîn, Welat- Roja 03.07.93'de Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) hewşa Zitadelle de jû şahiyê virayşte. Namê na hewşa Zitadelle-Spandau wendevananê rojname Welatî re ganî xerîb nêbo. Par jî naca 24.05.92 hetanî 30.08.92 rafîştene (sergî) Kurda biye û pêro piya 80 hezar kesî na rafîştene dibî. Sebetake demê na rafîştene de tayê alê Kurda ebi renganê kesk, sûr û zerdî amebî dardekerdene, ebi êxbar û mudahaleyê dewleta Tirkan, xêlê tengasî û problemî miyanê Kurda û Sentoyê Berlîn de veciyabî. Roja şemî wunciya na hewşe de Kurda vengê xo kerd berz. Her çiqade cayanê binande hemberê barbariya Tirkiye Kurda aksiyonê bîni jî kerdene, na şahiyê de nêzediyê 12000 Kurdî û dostê dîna beşdar bî. Programî sahatê 14.30 de dest kerd re ci û te de Domanê Agirî (Zarokên

Agirî), Koma Amedî (Koma Amed), Hozan re Eylem, Xanemîr Ganî Nar, Xemgîn û Koma Koyî (Koma Çiya) kilamê xo vatî, hunerê xo musnayî ma. Na şahiyê de bêguman huner û vatenê Koma Domana zaf şî re weşê goşdara. Goşdara hetanî nika Komêde musîkê domana ebi ne qelîta û ebi na zereweşiyê nêdibî. Seba nayê jî pêrinê piya govende gurete û hetanî dawîya programî govende kay kerd. Nê şahî ebi dore, roja 26.06.93 de Frankfurt de, roja 27.06.93 de Stuttgart da amebî virayştene û nayê ra dime jî roja 18.07.93 Hamburg roja 24.07.93 de jî Îsveçe de ênê virayştene û seba nê şahiya 39 kesê NÇM Swêdê ra amebî. Gor vatenanê î. Gencî ganî Hollanda û Fransa de jî nê şahî bere virayştene.

Na miyan de ma î. Gencî ra astengiyarê dîna, bîrûbaweriya dîna Kurdanê Avrupa ser ro û kulturê Kurda ser ro diyenê dîna pers kerdî. Ebî kilmiye î. Gencî

niya va: "Ma ser ro zorê dewletê esto, Kadroyê manêke şîkîne karê kulturî bikerê û avê berê şenikê. La belê karê ma wunciya avê şono û berhemê hecay jî dê. Nîna ra çand hebû nayê 3 kayê tiyatroyî Mişko (mere) jû hefte amê kaykerdene, Mirin û Jiyan (merdene û jiyene) hîrê aşmî amê kaykerdene û Dawa Genaralê Teneke (Dawa Generalê Tenekî) 15 rojî amê kaykerdene. Xêca nayê ra ma 4 kasetê musîkî vetî. Miyanê NÇM de ma Înstîtutê Kurdî (Enstituya Kurd) na ro, rojname Welatî û kovara Rewşenî vete. Avrupa de sebetake aksiyonê bîni bî, qeydoke ma wayştene Kurdî nêşikiyayî bêrê şahiyânê ma. Ne kêmasiye niya baş biyamêne ma kêfweş biyêne. Sebakê dewletanê Avrupa Kurdî welatê dîna ra visnê ganî Kurdî û rewşenbîrê Kurda wayirê kulturê xo vejîyê. Polîtîka teyna bes niya, ganî kar û mordemê nacayî tayîna berê organîsekerdene."



Ew kendeşî Kiwêt le snûriyê nêwan xoy u Êraq da deykêşê.

Dûr niye Amerîka carêkiy trîş dest le Iraq biweşênê

(SORANÎ)

Nûçeyên Derve- Warîn Krîstofêr Wezîriy derewey Amerîka gutiy derçûniy pîspokaniy ser be UN le Iraq "Nişaneyekîy pîr metirsiye." Şayaniy base em derçûney pîspokaniy pişkinîniy çekiy kîmiyewî u nawkeyî le Iraq ew kate rûyda ke rêjîmiy Iraq rêgey nedan kamêray pêwîst bo pişknîniy legel frokekanyanda bekarbênin. Herweha Worîn Krîstofêr gutiy: "Renge naçarbin carêkiy trîş dest le Iraq biweşênin eger mil bo briyariy jîmare 715 y encumeniy aşî ranekeşe: Le layekiy tîrewe ew tîpe huneriyey xerîke pişteneysayîş be drêjayî snûriy Iraq-Kiwêt dekêşê raygeyand ke 21 kîlometriy em pişteneyan tewaw kirdûwe. Sayaniy amajeye ke em piştene brêtiye

le noknedekiy 5m pan u 3 m qûl û perjînekîy gill.

Serokiy tîpiy pîsporekan le Bexda ke nawiya Nikîta Smîdoviç e gutiy grûpekeman naçare şariy Bexda becê bêlê leber ewey hikûmetiy Iraq rêgey nedawîn amêriy wênegirtin bo pişkinîniy şiweniy taqîkirdnewey mûşegekan bekarbênin.

Smîdoviç le dîmaneyekiy rojnamenûsî le Bexda guntiy "min le layenî xomewe hest be bê hîwayî dekem leber ewey nemantîwanîy helluwêstiy Iraq bigorîn." le riwêkiy tîrewe, çend rojêk lemewber nêrdeyekiy Iraqî le Bexda we berew Nîoyork kewte rê be niyazî wîtuwêj lebarey nardine derewey newtiy Iraqî we.

Rojnamekaniy Iraq rayageyand ke şîmaney ewe heye Bexda u UN lem wîtuwêjey Nî-

oyok da bigene çareserêk. Berêwebarayatiy Amerîka raygeyand ke ewan naqayil nabin le helgirtiniy beşê lew gemaro abûriyey le diway girtiniy kiwêt le abiy 1990 ewe xirawete ser Iraq.

Le Hewlêr qisekerêkiy berpirsiyar raygeyand ke hikûmetiy Kurdî li Iraq dawey bêşek eger herdû biryarî 706 u 721 cêbecê bikrên, cêgiriy serok wezîraniy hikûmetiy Kurdistan Roj Nûrî Şawes le Helêr be ajansiy "Frans Prês" yageyand ke hikûmetiy Kurdî mafiy ewey heye sê yekiy dahatiy newtiy xawiy Iraq werbigrê, emêş be giwêrey ewey ke jimarey Kurd sê yekiy danîştwanîy Iraq a. Herweha Dr. Roj guntiy "Hîwadarim netewe yekgirtuwekan mafiy Kurd biparêzê."

Partî û saziyên Tirk di meseleyekê de li hev dikin:

Tunekirina

Kurdan

Bi geşbûna pêşveçûna têkoşîna neteweyî re, partî û saziyên Tirk ji nû ve banga mutabaqata neteweyî li hev dikin. Ev rastî û sazî tevî hemû dijberiyên di nava xwe de, di yek meseleyekê de dikarin bêne kêleka hev û din. Ew jî pirsgirêka Kurdî û bi darê zorê tunekirina vê pirsgirêkê ye. Serokên partiyên Tirk, ji bo di vê meseleyê de hêzên xwe bikin yek, dê roja 12'ê Tîrmehê li Enqerê bicivin. Serokê ANAP'ê Mesut Yilmaz, bêtî ku hikûmetê jê daxwazekê bike, da xuyan ku di meseleya "teror"ê de, bi hemû hêza xwe ve li pişt hikûmetê ne. Partî û saziyên din jî beyanên bi vî rengî diweşînin. Serleşkeriya Ordiya Tirk jî bi beyanên xwe amadekariyên qirkirineke bi giştî eşkere dikin. Amadekariyên qetlîaman, li ber çavên dinyayê û bi zanîna partî û saziyên Tirk ve dimeşin.

Tirkîyê protestoya Swîsreyê red kir

Protestoya Hikûmeta Swîsreyê ya der barê bûyerên li Bernê ku Şemsettin Kurt tê de ji hêla wezîfedarên konsolosa Tirk ve hatibû kuştin, ji aliyê hikûmeta Tirk ve hate redkirin. Protesto di 7'ê Tîrmehê de hatibû şandin. Di daxuyaniya Wezîriya Karên Derveyî de hat gotin ku amadekariya bersiva protestoya Hikûmeta Swîsreyê (Îsvîçre) tê kirin. Di daxuyaniyê de tê kifşkirin ku, notaya Hikûmeta Swîsreyê xalên ku nayên qebûl kirin di hundirîne. "Der mafê naveroka notaya Hikûmeta Swîsreyê de tu daxuyanî ji aliyê Wezîriya Karên Derveyî ya Tirkîyê ve nehate kirin. bes redkirina notayê hate diyarkirin. Ji aliyê din ve Berdevkê Wezîriya Karên Derveyî yê Hikûmeta Swîsreyê li Bernê daxuyandibû ku ji bo lêgerîn û lêpîrsîna li ser bûyerê ji hêla Tirkîyê ve hatiye redandin, li ser vê yekê wan jî ev rewşê bi notayekê protesto kiriye. Li gorî diyarkirina Berdevkê, di notayê de nêrîna, "Hikûmata Swîsreyê bi awayekî xweşkahî li bûyera ku ji nûnerîtiya welatekî biyan çek li gel bê teqandin nayê qebûl kirin û pevçûneke ku koka wê li derve ye nayê pejirandin" tê parastin.

Ewrûpa bi livbaziyan Kurdan diheje



Li gelek bajarên Ewrûpa, bi taybetî jî li Bonnê bi deh hezaran Kurd, Tirk û Ewrûpî bi hevkarîya rêxistinên Kurd û Tirk li dijî polîtîkayên dewleta Tirk û hevkarên wê yên împeryalist meşyan.

Navenda Nûçeyan- Livbaziyan Kurdan ên ji bo protestokirina qirkirîna KT'ê (TC), bi piştgiya rêxistinên çep ên Tirk ve li pîrriya bajarên Ewrûpa didomin. Dewletên Ewrûpî li hember van livbaziyan li çareyan digerin û polîtîkayên xwe yên ku li ser alîgiriya KT'ê hatiye saz kirin, ji nû ve dinirxînin.

Roja 3'yê Tîrmehê, bi organîzasyona Yekîtiya Eniya Neteweyî ya Kurdistanê û Yekîtiya Hêzî ya Şoreşger û Demokrat li bajarên Koln, Bern, Parîs, Viyana, Frankfurt, Hannover, Studgard û Grazê meşên girseyî pêk hatin. Bi deh-hezaran Kurd û Tirk bi armanca protestokirina "Şerê qirêjî yê li Kurdistanê didome, Cinayeta li Bernê û Êrîşên li hember tevgera Kurd" beşdarî van meşan bûn.

Meşvan di van livbaziyan xwe de protestoyên balkêş pêk anîn. Di destê meşvanan de tabûten ku li serê "KT dewleteke terorîst e" hatibûne nivîsîn, hebûn û ev tişt bala temaşevanan gelek kişande ser xwe.

Rêxistinên Yekîtiya Eniya Neteweyî ya Kurdistanê Hevgirtin-PDK, KAWA, PİK, PKK, PRK/Rizgarî, PRNK, PSK, RNK/KUK, TSK, Yekbûn, KKP û rêxistinên Yekîtiya Hêzî ya Şoreşger û Demokrat PKK, Tevgera TKP-ML, TDP, TKP-Kivîlcim, TKEP, MLSBP, Devrimci Partizan

û KAWA ev livbazî bi armanca bala raya giştî ya navneteweyî bikişînin ser qetlîamên Kurdistanê pêk anîn. Ev livbaziyan ku li bajarên cur be cur ên Ewrûpayê pêk hatin, ji bo vê armançê bûn gavên girîng.

Li paytexta Swîsreyê (Îsvîçre), Bernê cenazeyê Fahrettin Kurt ku ji aliyê wezîfedarên konsolosiya Tirk ve hatibû kuştin, ji hêla meşvanan ve hate teslîmgirtin û mitîngek pêk hat. Cenaze piştî mitîngê ji balefirgehê şandin Dîlûk (Entab)ê û li vir bi beşdariya girseyek gel ve hate binax-



Şemsettin Kurt

kirin. Mebûsên HEP'ê Remzî Kartal û Alî Yığıt jî beşdarî merasîma cenazeyê Fahrettin Kurt bûn.

KURD LI DERIYÊ NY'Ê

Roja 8.7.1993'yan Kurd li Parîsê avahiya UNESCO, li Stocholmê jî avahiya Komîseriya NY (Neteweyên Yekbûyî)ê îşxal kirin. Li Cenewreyê jî li ber derê avahiya NY'ê xwepêşandaneke pêk anîn.

Xwepêşandana Stocholmê piştî ku nameya wan ji Serokê NY'ê Butros Gallî re bi faksê hate şandin dawî lê hat. Name bala NY'ê dikişîne ser qetlîam û êrîşên KT'ê ku li Kurdistanê dimeşîne. Livbaziyan Cenewre û Parîsê jî, demêke dirêj domiyan û dû re, bi biryara ku dê livbazî bidomin dawî li livbaziyan hatin.

Dadgehê Komcivîna Kurdî îptal kir

Serilêdana hinek rewşenbîrên Kurd û Tirk ji bo çêkirina komcivîneke li ser pirsgirêka Kurdî, ji aliyê Dadgeha Îdarî ya Herêmî ve hat redandin.

Berî mehekê, hinek rewşenbîr xwestibûn ku di navbera rojên 25-27'ê Hezîranê de komcivînekê li dar bixin. Lê ev

komcivîna bi destê Waliyê Enqerê ve hatibû qedexekirin. Bi sedema ku dê wê komcivînê hin gelemşeyên xwe re bianîna.

Lê sazgerên komcivînê ew biryar li cih nedîtibûn û ji lew re serî li Dadgeha Îdarî ya Herêmî dan. Lê ew daxwaza wan vêca bi destê dadgehê hate redkirin.

Li Edenê polîsan teror pêk anî

Navenda Nûçeyan- Di 2'ê Tîrmeha 1993'yan de du gerîla bi navê Hasan Kutlu û Fahrî Çelik di şerê bi hêzên dewletê re zindî hatin bûn girtin, lê dû re ji aliyê polîsan ve tîr kuştin, cendek jî teslîmî malbatan nayên kirin û tîr revandin.

Ji bo protestokirina vê

rewşê esnafên taxên Dağlioğlu, Barbaros, Gülbahçesi, Şakırpaşa, Denizli, Karasu, Anadolu, Kiremithane, Yavuzlar, Şehît Erkut Akbay û 19 Mayıs di 6'ê Tîrmehê de kepengên xwe daxistin, meşeke ku ji 2 hezar kesî pêk hatibû li dar xistin. Li hember vê protestoyê polîs sere rast gul-

le li gel reşand; 70 kes birindar bûn 100 kes jî hatin girtin. Xortekî 19 salî yê ku pankarta "Em miriyên xwe dixwazin" hilgirtibû di bin panzera polîsan de perçiqî. Di vê navê de zarokên ku di nav kuçeyan de belav bûbûn bi sloganên "Bijî Serok Apo", "Kurdistan dê ji faşîzmê

re bibe goristan" diqîriyan.

Gel berî meşê li dar bixwe ji wilayetê cendekên gerîla xwestin, lê Waliyê Edenê Bekîr Aksoy daxwaza wan qebûl nekir û wiha axivî: "Meşên ku hûn li dar dixin dû re dibin mitîng. Dewlet mezin e, em nahêlin kes bi-meşe."

Ronîkirina dîroka Kela Melazgirê



Pireke kevnare: Pira Keçikê

Encî Egît

EFSENEYA PIRA KEÇIKÊ

Navê Melazgirê yê dîrokî bi Kurdî **Kela** ye. Li du gundên Melazgirê 'Hesuna' û 'Bostanqa' du kelayên dîrokî hene. Ev kela ji pêşya mîladê ji Medan mane. Ji xeynî van, bi navê **Pira Keçikê** esereke din jî heye li herêmê. Pira Keçikê ji dema Ûrartûyan berya zayînê 950 de hatiye çêkirin. Çirokeke wê ya zehf xweşik û balkêş heye: Ji gotinan, li vê herêmê gelek bax(rez) hebûne, erd ji hêşîna deviyên nedixuyaye. Li cihê ku niha Pira Keçikê lê ye, çemekî pirr kûr û gurr hebûye. Dilketiyê keça hukumdare herêmê dema ku rojekê diçe nav daristanê, dikeve çem û tê de dixeniqe. Keçik zehf ber dikeve, bi rojan digrî, tiştêkî naxwe û herdem li ser çareyekê mijûl dibe. Dawî çareyekê tê hişê wê. Keçik bi hêza ku evîna dilê wê didê, dest bi xebatê dike. Werîsan çêdike ji bo ku pê keviran bikişîne. Rîsê wê xelas dibe, lê werîsê tamam nabe, kêr dimîne. Keziyên xwe jê dike, werîsê pê tamam dike. Diçe Xelatê, bi werîsê keviran kaş di-

ke. Bi hêza evîne dikare bi tenê van kevirên giran hilde. Hengî kevir giran in, dema wan hildide, şopa tiliyên wê tê de dimînin. Bi tenê keçik pirê çêdike, lê şopa pore wê, tiliyên wê û navê wê li ser pirê dimînin. Niha ev pir li ser erda ziwa ye. Salên şilî bin, ev pir avên şiliyê dişixtîne û ji vê avê re jî gelê herêmê dibêje 'Ava çivîkan.'

Gelê Kurd li kudera Kurdistanê dibe bila bibe, rojek ji ya din zehftir şiyar dibe û dixwaze li xwe û dîroka xwe xwedî derkeve, dîroka gelê xwe û ya welatê xwe zêdetir meraq dike. Weke barana biharê bi hezaran pirsan ji xwe dike! Weke hozanê mezin Cegerxwîn gotî "Kîne em?" her roj zêdetir dibin, ne ez jî insan im. Nijadeke min jî heye, ez Kurd im! Kurd ji kîjan Qewmî ye? Dîroka Kurd kani? Li ku nivîsiye? Kê nivîsiye. An di tariyê de ye? Belê hemû Kurd dizanin ku tiştên di tariyê de mane zaf in.

Lê weke ku girsên gel der mafê dîrok û eslê xwe de zaf tiştan meraq dike, ronakbîrên gelê Kurd jî bi ser dîroka gelê Kurd û welatê xwe mijûl in. Çapemeniya Kurd rastiya Kurd û Kurdistanê bi me dide

nîşan. Belê dîrok car din tê nivîsandin; weke Behra Wanê xwîna Kurd hibir (murrekeb) be dar û devî yê Kurdistanê jî, pênuş in. Ez xwe rewşenbîr qebûl nakim. Divê rewşenbîr berî hemû tiştî der mafê karê ku dike de zaniyar be. Min heta niha li ser dîrok û arkeolojiyê vekolîn nekiriye. Ev ni-

Girsên gel der mafê dîrok û eslê xwe de zaf tiştan meraq dike. Ronakbîrên gelê Kurd jî bi ser dîroka gelê Kurd û welatê xwe mijûl in. Çapemeniya Kurd rastiya Kurd û Kurdistanê bi me dide nîşan. Belê dîrok car din tê nivîsandin; weke Behra Wanê xwîna Kurd hibir (murrekeb) be dar û devî yê Kurdistanê jî, pênuş in.

vîs vekolîna min a pêşîn e. Lê ez vê wek rastiyeke qebûl dikim ku mirov ji bo karekî xwe mecbûr bibîne, bi çî awayî be wê pêk bîne.

ESERÊN DÎROKÎ

Pira Keçikê bi hezaran sal e li piya ye. Ji beriya mîladê di nehsed, nehsed û pêncî de çêbûye. Li gor vekolîna ku min li pirtûkxaneyê Melazgirê kir ev eser ji dema Ûrartûyan maye. Der mafê dîroka pirê de li pirtûkxaneyê tiştêkî zehf zelal tune ye. Tiştên heyî ev in: Ji Ermeniyên an ji êzîdîyan maye. Eserên dîrokî yên ji pêşya Mîladê mane ne tenê Pira Keçikê ye. Ji dema Medan jî eserên arkeolojîk mane, weke **Kela Bastanqa û Kela Hesûna**, Hesûna û Bostanqa du gundên nêzîkî Melazgirê ne. Ev Kela ji zinarên zehf mezin ên yekker çêbûne. Zinar hatine û şûna hukumdaran tê de çêkirine. Navê Melazgirê yê qewartin Kurmancî bi ihtîmalekê, ji van kelayan hatiye girtin. Navê Melazgirê Kurmancî (Kela) di nav gelê herêmê de dîrokî û eddillî ye. Em werine ser çêkirina Pira Keçikê. Ew ji kevirên Xelatê yên sor ên mezin û kilsê yanî bi zimanê arkelogan ji çimentoya spî çêbûye. Li ser kevirên pirê şopa 5 tiliyan heye, şopa 5 tîmek jî por heye. Lê di van salên dawî de mirov dizane ku şopa tiliyan gelekê heşifi-

ye. Ji ber ku şopa tîmek por li ser e, jê re tê gotine Pira Keçikê. Dirêjahiya pirê 5 metro heye, bilindaya wê jî li dora pênc metro ye. Pira Keçikê jî, wek hemû dewlemen-diyên Kurd û Kurdistanê ji asimilekirina hêzên biyanî para xwe hildaye. Navê wê yê asimilekirî "Kiz Köprüsü" ye û ji ber ku baş nayê parastin, ji ber erezyonê sal bi sal kevin dibe, ji hev dikeve û nizim dibe. Kela Melazgirê ya dîrokî û Pira Keçikê jî weke gelê Kurd li ber xwe didin; ji bo azadî û serxwebûna nêzîkbûyî. Ên ku dîroka Melazgirê meraq dikin dikarin li kitaba M. Kizilkaya, H. Nebiler a bi navê "Dünden Yarına Kürtler" mêze bikin. Dema di 1071'ê de Selçûkî Melazgirê zêft dikin û ji xwe re dikin deriyê ketina Kurdistanê, Kurd jî dibin, pira dîne îslamiyetê. Wê demê Tirk û çend eşîrên Kurd ên xiniz derbeke mezin li Kurd û Kurdistanê dixin. Ji wê demê ta îro qetlîam, koçberî û asimilasyon ji vê herêmê jî wek hemûyê Kurdistanê xelas nebûye.

Navê Melazgirê û gundên wê bi Kurdî ev in:

Kela - Malazgirt
Aklar - Alik
Akören - Axwêran
Allıkalkan - Alyar
Çayirdere - Dêrik
Aslankaya - Qasimyarizabegê
Aynalihoca - Eynexoc
Bahçe - Bexçe
Başçatak - Çat
Beşdem - Şekirava
Bostankaya - Bostanqa
Boyçapkin - Boyçapxûn
Boydere - Xirabêşehîr
Doğantaş - Kesûk
Dolabaş - Kanikork
Gölağlı - Tolebaş
Dinimpinar - Silêkotlo
Konakkuran - Xanik
Karakaya - Duhu
Gölkuru - Xirbe
Kılıç - Qiliçe
Hanoğlu - Xanê
Hasanpaşa - Hesempaşe
Karakoç - Kêranlix
Kuruca - Qiruc
Moğalcık - Meyxelcux
Kizilyusuf - Qizilusiv
Koçalı - Mergaçoçeli
Molabakı - Melebao
Mezra - Tozkakortê
Küçükmezra - Tozkarastê
Hasretpınar - Tendürek
Şekerbulak - Şekirbilax
Tatlıca - Hasuna
Yaramış - Yaremîşa
Yenice - Gundikênû
Yukankıcık - Qicixêjorîn
Nurettin - Nordin
Moladerman - Meledermanan



Bêyî rexneya hunerê, dîroka hunerê jî nayê çêkirin. Rexneya hunerê jî ku xwe nespêre nêrîneke estetîk, nikare li ser piyên xwe bimîne.

B. Cömert

Heval tu jî firaqan dişoy?

Kerîm, yazdeh salan li Zîdana Diyarbekirê girtî mabû. Rojek berî rojê dixwest bigihîje partiya xwe. Heval û hogirên xwe bibîne. Wan hambêz bike, kêmasî û xeletiyên xwe sererast bike, berê xwe bide armanca xwe. Yazdeh sal zîndan... Îşkence û lêdan... Zilm û zor dîtibû. Lê belê tu carê ji evîna Kurd û Kurdistanê dîr neketibû. Rihê têkoşînê xwe berdabûn hemû hucren wî.

Jê re gotin: "Divê tu herî Cizîrê!..." Çû. Ew danîn mala milîsekî. Milîs, yekî gundî bû. Gundîkî mîna pizotan bû. Hi-nek sohbet kirin.

- Heval navê te bi xêr?
- Mihemed
- Ser çavan
- Ser û çav neêşin
- Heval tu jî firakan dişoy?

Navê xwe rast negotibû.

Lakîn, xwediyê malê çima wiha pirs li ser pirsan dikirin? Ew jî fêhm nekir. Sekinî. Fikirî. Biryara xwe da:

- Na!..
- Êêê... Baş e. Nexwe tu hevalê min î, ne yê xanimê yî...

- Min fêhm nekir!.. Yazdeh salan min firak şûştin. Eger girîng be ezê dîsa bişom. Lê belê bi kêfa te ez naşom!..

- Na heval, na.. Ez jî ne referdarê şûştinê me. Hema, hevalê wekî te tîm mala me. Xwarinê dixwin û gir gir baz didin mitfaxe... Lê belê dixuye



ku tu ne ji wan î...

Bermaliya wî hat hundir. Ji-neke bi rûmet, devbiken. Destê xwe da ber piştê xwe û li me zivirî:

- Çi ye heval, ew dinê ha ji te re çî dibêje?

- Behsa firaqşûştinê dike. Hevalê ku berî min hatine wiha kirine.

- Tu li wî guhdarî neke. Ne ji eleştiriyê (rexneyê) ne jî, ji özeleştiriyê (xwerexnekirinê) fam dike.

Axatiyê dimeşîne. Lê belê gava hevalan dibîne, dibe şoreşger...

Xwediyê malê Qasim hêrs bû.

- Jixwe çî hate serê me, ji wê eleştiriyê- özeleştiriyê hat... Em çawa bikin, "Heval ew çewt e... Heval ew ne rast e... Heval li ser xwe bisekine..."

Ne mêr ma ne mêranî... Yekî-tiya mêr û jinê; taliya dinê ye... Ne wiha ye bavo!...

Mirovekî kal jî li ba me rûniştibû. Min nizanibû ku bavê Qasim e. Dît ku em muneqêşê dikin ew jî ket navê.

- Siltan rast dibêje qewad!... Ma çî bûye ku tu jî li nava mala xwe bişixulî. Gava Siltanê xwarinê çêdike, tu jî rahêje keçika xwe. Heval rast dibêjin. Piştî vî emrî min rastîya wan qebûl kir!... Tiştê jî, ji min kêhm nebû. Lê hema tu qebûl nakî. Tu Rostemê Zal î. Tu Anter î bavo... Wellahî-billahî ku vê neqlê heval bîne ezê ji wan re bibêjim, bila te ciza bikin... Zindîqê, zindîqê. De tu mêr bî, li hemberî wan xeber bide. Ne wilo ye mêvanê delal, birayê Mihemed...

Şükrü Gülmüş

TÎR

Musa Anter



Riya azadiyê

Î ro min rojnameya Welat stand û quncikê nivîsarên te 'Tîr' valabû. Ez gelekî bi ser xwe de fikirîm û bi hêrs bûm, min nizanibû ku ezê çî bikim. Li Kurdistanê, gava mirovek bêheq tê kuştin kesên wî, bira û kurmam diçin heyfa (tola) wî hiltînin û qatîl didin ber gulleyan. Lê emê çî bikin? Ma qatîlê te kî ye? Qatîlên te ne yek, ne dudo ne û ne jî hezar in... Qatîlên te bi milyon in, dewleta Tirk û peyman-darên wê li rojava û rojhilatê, çav û kesên xwefiroş û bêwijdan hemû qatîlê te ne, hemû li benda rawestandina dilê te bûn. Kuştina te ne ji ber ku tu Musa Anter bûy, sebaba kuştina te, weke qatîlan bi xwe dan zanîn sêparatîzma (cudaxwaziya) te bû. Cudaxwaz, di ferhenga dijminên azadiyê de, her Kurdekî ku dixwaze û dixebite ji bo Kurdistanê serbixwe û azad.

Apê Musa, qatîlên te gelek in û ne mimkûn e mirov karibe hemûyan bigire, bibe mehkemeyê û ceza bike. Tenê bi tiştê mirov dikare wan giştîyan ceza bike, ew jî bi geşkirin û xurtkirina têkoşîna rizgariya neteweyî; li her aliyê welat. Çimkî ne tenê dewleta Tirk, lê belê hemû dagirkerên din jî kuştina mirovên Kurd li hundir û derveyê welat berdewam dikin.

Apê Musa, qatîlên te gelek in û ne mimkûn e mirov karibe hemûyan bigire, bibe mehkemeyê û ceza bike. Tenê bi tiştê kî mirov dikare wan giştîyan ceza bike, ew jî bi geşkirin û xurtkirina têkoşîna rizgariya neteweyî; li her aliyê welat. Çimkî ne tenê dewleta Tirk, lê belê hemû dagirkerên din jî kuştina mirovên Kurd

li hundir û derveyê welat berdewam dikin.

Berî çend rojan 4 mirovên Kurd li Berlînê jî hatibûn kuştin. Her wiha li başûr û bakurê Kurdistanê her roj zarokên me tîm kuştin. Bi ser vê yekê de dijmin hazi-riya şerekî birakujî yê mezin dike û Siloyê teres dibêje: "Bila ew hevdu bikujin."

Ji ber vê yekê ez gazî hemû mirovên nîştimanperwer, aşîxwaz, azadîxwaz û mirovhez dikim, ka em dengê xwe bilind bikin. Na ji bo şerê birakujiyê! Ez gazî her rêxistin û partiyekî Kurd dikim, dev ji nako-kiyên xwe berdin, dev ji taktîk û diplomasiya şaş berdin.

Riya azadiyê tenê di yekgirtina gelê Kurd re derbas dibe. Dostên me di nav dewletên cihanê de nîn in, riya azadiyê di Enqerê, Bexdayê, Tehranê û Şamê re derbas nabe, ka werin, hema carekê bi tenê, riya yekgirtinê jî tecrûbe bikin (biceribînin). Hemû rê me tecrûbe kirine, ma çima em vê riya han ji bir dikin? Ka werin ji bo xatirê Apê Musa, ji bo ku gotinên wî vala neçin, ji bo xatirê hezaran şehîdên riya azadî û serxwebûna Kurdistanê.

Apê Musa,

Min gelekî dixwest ez bi nêzikî te nas bikim û tu rojekê bibî mêvanê me, lê çî bikim dijminên azadiyê, dijminên mirovayetiye ev fersend nedan. Ez di wê hêviyê de me, ku te gelek mirovên Kurd şiyar kirin û îro ji wan tê xwestin ew doza te pêş ve bibin û bigihînin serî.

Biraziye te Dr. Kemal Sîdo-Kurdaxî
Marburg / 24.9.1992

Jûjî...

Doğan Güzel



Têkoşîna neteweyî ya gelê Kurd li bajarên Tirkiyê jî hêza xwe bilind û fireh dike. Bi tesîra pêla vê têkoşînê:

Gelê Tirk jî bi ser xwe ve tê

Navenda Nûçeyan- Bûyer û livbaziyan her hefteya ku tê, ji ya dinê zehftir dibin. Qetliamên dewletê jî zêde dibin.

Gelê Kurd jixwe ji mêj ve li hember van qetliaman dengê xwe derdixe û serî hildide.


Di van hefteyên dawî de gelê Tirk jî êdî bêdeng namîne. Baweriya gelê Tirk jî bi dewletê nemale. Ev bêbawerî rayadarên dewleta Tirk dixwe quncik û nema dikarin qetliamên xwe veşêrin. Qetliama li Sêwazê ev bêbawerî ya gel a bi dewletê hîn zêdetir kir. Bûyer û livbaziyan ku bêrawestî li Kurdistanê diqewimin, li Tirkiyê jî êdî roj namîne ku xwe nîşan nedin. Meşên ku li bajarên Enqerê, İzmir û Stenbolê li dijî qetliama Sêwazê hatin lidarxistin, bêbawerî ya gelê Tirk a bi dewletê nîşan da.

Olperestên fanatik û faşistên Tirk, li Sêwazê qetliamê li hember beşdarên şahiyên Pîr Sultan Abdal pêk anîn û di otelekê de 36 kes ji van beşdarên şewitanandin. Di nava kuştîyan de hunermend, nivîskar û rewşenbîrên navdar jî hene. Ev qetliam li ber çavên hêzên dewletê pêk hat. Di dawîya bûyerê de eşkere bû ku, qetliam bi organîzasyona kontrogerîla, olperestên şerîetxwaz û faşistên Tirk qewimiye Rayedarên dewletê û çapemeniya Tirk nivîskar Azîz Nesîn weke berpirsiyarê vê bûyerê derxistin pêş. Azîz Nesîn jî bi beyanên xwe diyar kir ku qetliama Sêwazê bi alîkariya hêzên dewletê pêk hatîye û dewlet dixwaze vê rastiyê veşêre.

BÛYER ÇAWA DEST PÊ KIR?

Şahiyan Pîr Sultan Abdal, her sal di destpêka meha Tirmehê de, li navçeya Banazê ku li ser Sêwazê ye tê pîrozkirin. Pîr Sultan Abdal, yek ji hozanên kevin ê elewî yê herî bi nav û deng e. Di dirokê de bi serhildana xwe ya li hember dewleta Osmanî tê nasîn. Ev serhildana Pîr Sultan Abdal bi ser nakeve û li hember hêzên Osmanî têk diçe. Pîr Sultan Abdal tê girtin û hêzên Osmanî ew li sûka Banazê dişewitînin. Ji Pîr Sultan Abdal, gelek helbestên bi nav û deng gihiyane vê rojê û Pîr Sultan Abdal, di nava elewîyan de hem bi serhildana xwe, hem jî bi helbestên xwe weke mirovekî pîroz tê nasîn.

Komeleya Pîr Sultan Abdal, şahiyên îsal li Sêwazê organîze kir û gelek hunermend, nivîskar û rewşenbîrên navdar vewwendiyê şahiyên kir. Li gor bernameya komelayê, dê herdu rojên pêşîn li Sêwazê 3 rojên dawî jî li Banazê şahî pêk bihatana. Li go-



Polîsên ku li Sêwazê qetliam temaşê dikirin, li Stenbolê êrîşê birin ser mirovên ku qetliama Sêwazê protesto kirin.

riî ve bernameyê, dê şevên şahiyê pêk bihatana û di van şevan de, dê gelek hunermend hunerên xwe pêşkêş bikirana. Dê nivîskar pirtûkên xwe îmze bikirana û dîtînen xwe ji gel re bianîna ziman. Gelek karîkaturîst û ressam jî, ji bo pêşkêşkirina berhemen xwe di pêşangehan de, hatibûne Sêwazê.

Ev bername roja yekemîn bi problem domiya. Di vê navê de gelek nivîskar li Navenda Çandî ya Sêwazê pirtûkên xwe îmze û bi xwendevanên xwe re sohbet dikirin. Nivîskar Azîz Nesîn, li gor dîtînen xwe meseleya dîn bi xwendevanên xwe re şîrove dikir. Lê ev axaftînen Azîz Nesîn, di rojnameyên herêmî de bi guhertin hatin weşandin û bûn hinceta provakasyonên kevneperest û faşîstan.

PROVAKASYON JI CAMIYAN DEST PÊ KIR

Misilmanên sunî, ew roj bi pirranî ji bo nimêja îne li mizgeftan(camiyan) bûn û meleyên kevneperest di weazên xwe de tovên qirkirinê diçandin. Bi van propagandayên organîze, gel hate dagirtin û bi rênîşandana provakatoran, pêşî bi ser Navenda Çandî ya Sêwazê re girtin. Nêzîkî 400 olperestî bi kevir û daran êrîşê beşdarên şahiyê kirin. Di êrîşa yekemîn de, beşdarên şahiyê li ber xwe dan û êrîşkaran dût kirin. Êrîşkar cara duyemîn, lê vê carê bi hejmareke zêde kes ve ji nû ve cerdî navendê kirin. Beşdar jî nû ve li ber xwe dan û xwe ji êrîşa olperest û faşîstan parastin. Di vê navê de polîs li cihê bûyerê bûn, lê dest nedan

êrîşkeran. Êrîşkerên kevneperest, li ser berxwedana kesên li navendê berê xwe dan otêla ku mêvanên şahiyê lê ne.

Hunermend, nivîskar û rewşenbîrên mêvanên şahiyê, li otelê asê mabûn. Êrîşkar peykerê (hêkelê) Pîr Sultan Abdal jî, hilki-ribûn û bi xwe re kişandibûn cihê bûyerê. Li seriya 10 hezarî kes bi sloganên: "Em şerîet dixwazin", "Ji Azîz Nesîn re mirin" û hwd. û bi tekbîran kevir divirvirandin otelê. Faşistên provakator ku di destpêka bûyerê de li refên pêşî bûn, bi sorbûna gel re xwe vekîşandin refên dawî û olperestan ji bo qetliamê tûj kirin. Nêzîkî 60-70 kes ji mêvanên di otelê de mehsûr mabûn û tu rîya xelasiyê nedidîtin. Polîs û leşker mudaxeleyî êrîşkaran nedikirin. Heta çend ji polîsên sivil û resmî, bi awayekî vekirî alîkariya êrîşkeran dikirin.

Êrîşker, bi benzîne agir berdan lobiya otelê û qetliam dest pê kir. Agir her diçû geş dibû û îtfaiya belediyê nedihat cihê bûyerê. Heta ku îtfaiye xwe gihand cihê qetliamê 35 kes ji düyê agir fetisîbûn û yên mayî jî ku Azîz Nesîn jî di nava wan de bû, bi pêplûkên erebeya îtfaiyê hatin rizgarkirin. Polîs ên ji bûyerê sax filitîbûn revand, birîndaran jî rakir nexweşxaneyê.

36 KUŞTÎ BI HEZARAN QATIL

Hejmara kuştîyan, bi yekê ku li nexweşxaneyê mir re gihîştê 36'an. Bi hezaran kevneperestên ku beşdarî vê qetliamê bûn jî, li ser mudaxeleya derengmayî ya polîs û leşkeran belav

bûn û piştî bi çend saetan jî, derketina derve hate qedexekirin.

Di nava kuştîyan de gelek nivîskar, hunermend û rewşenbîr jî hebûn. Navê hinek ji wan ev in: **Asim Bezircî** (nivîskar), **Behçet Sefa Aysan** (nivîskar), **Nesimî Çimen** (hunermend), **Hasret Gültekin** (hunermend), **Asaf Koçak** (karîkaturîst), **Muhlis Akarsu** (hunermend) û gelek nivîskar û hunermendên din."

DI QETLIAMÊ DE TILIYA PARTIYA REFAHÊ

Di qetliamê de, serokê beledîya Sêwazê Temel Karamolloğlu, Endamê Meclîsa Beledîya Sêwazê Cafer Erçakmak, Midûrê Emniyetê û hin ji serbazan wek berpirsiyarên vê qetliamê tene tewandarkirin. Qasetên vîdyoyê yên ku di dema bûyerê de hatin kişandin, berpirsiyariya Cafer Erçakmak îsbat dikin.

Li aliyê din, waliyê Sêwazê jî ji ber ku di wextê de tedbîr nestandîye tê suçdarkirin. Beyanên rayedarên dewletê yên piştî qetliamê jî, kir ku her kes tiliya dewletê di vê bûyerê de bigere. Lewre ji Serokwezîr Tansu Çiller ta Wezîrê Karê Hundîrîn Mehmet Gazioğlu, serokên partiyên din û berpirsiyarên hin saziyan, rojname û kovarên KT'ê(TC) hemû bi yek dengê, Azîz Nesîn ji van bûyeran berpirsiyar girtin. Bi gotîneke din, di şûna kujyaran(qatilan) de, kuştî hatin mehkûmkirin.

LIVBAZIYÊN PROTESTOYÊ

Piştî ku qetliam hate sehkirin, li Tirkiyê û Kurdistanê livbaziyan

mezin pêk hatin. Li Cizîrê esnaf ji bo protestokirina qetliama Sêwazê kepengên xwe girtin. Dû re jî meş û livbaziyan mezin pêk hatin. Livbaziyan protestoyê bi awayên cur be cur didomin. Li Dêrsim û navçeyên wê Xozat û Pûlûrê(Ovacikê) jî qetliam hate protestokirin. Li Xozatê esnaf dikanên xwe girtin. Li Pûlûrê jî meş pêk hatin.

Li metropolên Tirkiyê jî, livbaziyan mezin pêk hatin. Stenbol bi livbaziyan protestoya qetliamê diheje. Bi hezaran mirov beşdarî van livbaziyan dibin û dewlet protesto dikin. Polîs gelek caran mudaxeleyî van livbaziyan dike û dixwaze rê li ber van livbaziyan bigire. Li aliyê din li Sêwazê, li taxa Alîbaba ku bi giştî elewî lê dijîn, livbaziyan meşên girseyî pêk tên. Di van livbaziyan girseyî de sloganên ku girseyên gel diqîrin gelek balkêş in: "Bila gerîla bikeve Sêwazê, xelasiya me di destê gerîla de ye" û hwd. Ev slogan di meşên li metropolan de jî tene avêtin û gerîla mîna hêviyeke mezin di nava girseyên gel de tê bilindkirin.

BI SEDHEZARAN GEL LI MERASÎMA CENAZEYAN BÛN

Cenazeyên 23 kesan ku di qetliama Sêwazê de hatibûne kuştin, bi beşdariya 400 hezar kesên welatparêz, pêşverû û şoresger ve li Enqerê hatin binaxkirin. Girseyên gel ên Kurd û Tirk,



Zêdeyî sedhezaran mirovên Tirk û Kurd li dij dewlê

Nûçeyên cengê

bi yek dengê dewlet protesto kirin. Cigirê Serokwezîr Erdal Înönü, hikûmet û bi taybetî jî Wezîrê Karê Hundirîn Mehmet Gazioğlu ji qetlîamê berpirsiyar hatin girtin û îstifakirina wan hate xwestin.

Cigirê Serokwezîr Erdal Înönü û hin mebûsên SHP'ê jî beşdarî meşê bûbûn. Lê meşvan êrişî Înönü û mebûsan kirin. Polîs vê grûbê bi zor ji destê gel xelas kir. Meşa li Enqerê 7 saetan domiya û bi binaxkirina cenazeyan belav bû. Di vê meşê de jî bi sloganên bang li gerîla hate kirin da ku bigirin bi ser Sêwazê ve. Li aliyê din erebeyeke polîsan jî aliyê meşvanan ve hate rûxandin.

Cenazeyên nivîskar Asim Bezirci û hunermend Nesîmî Çimen jî li Stanbolê hatin binaxkirin. Zêdeyî 200 hezar kes beşdarî meşê û xwepêşandanên li Stanbolê bûn. Nesîmî Çimen li goristana Karacaahmet, Asim Bezirci jî li goristana Zincirlikuyu hatin binaxkirin. Li ser daxwaza malbatên wan nimêja cenazeyan nehatin kirin.

Polîsên Stenbolê pêşî xwestin ku rê li ber meşvanan bigirin. Li taxa Mecidiyeköy, polîs mudaxelêyî meşvanan kirin. Meşvan jî li hember polîsan bédeng neman. Li ser vê yekê polîs meşvanan gullebaran kirin û du kes birîndar bûn. Li ser rîya meşê, avahiya partiya faşîstên Tirk MHP, avahiyên Faysal Finans û Al Baraka Turk, jî aliyê meşvanan ve bi kevîran hate kutan. Meşvan li Stenbolê jî bi sloganên xwe bangî gerîla kirin, da ku bigirin bi ser Sêwazê ve.

Li aliyê din li ser banga PKK'ê roja 7'ê Tirmehê li taxa Gazi Osmanpaşa, roja 8'ê Tirmehê jî li taxên Okmeydanî û Örnektepe esnaf kepengên xwe girtin.

● *Şerê çekdarî yê rizgariya neteweya Kurd li hemû deverên Kurdistanê roj bi roj geş bû, gel jî li metropolan û Ewropa bi protestoyên girseyî û girtina kepengan piştgiriya xwe diyar kirin. Êrişên gerîlayên ARGK'ê yên xurt ku li hember avahî û hêzên leşkerî yên dewletê pêk hatin, hêzên dewletê jî berê xwe bêhedef dan gelê sivil û gundan şewitandin. Kurdistan ji Botan ta Serhedê û vê dawiyê jî herêmên başûrê rojava seranser bi balefirên leşkerî hatin bombekirin.*

Navenda Nûçeyan- 3-4

Tirmeh 1993: Gerîla avêt ser navenda bajarê Îdirê. De vê êrişê de gerîla bi roketan avahiya "Köy Hizmetleri" girtîgeh û dibistanekê texrib kirin. Berî sê rojan jî gerîla êriş biribû ser Tabûra Cendirmayan ya Îkizceyê ku li ser Şîrnexê ye xesareke mezin dabûn avahiyên leşkerî. Li ser vê êrişê hêzên dewletê jî berê xwa dan gundê "İkizceyê" û mezra Bestkamêrsina, malên gundiyan dan ber gulleyan. Bi vî awayî cihwarên van gundan dev ji gundên xwe berdan û koç kirin. Êrişên gerîla yên li ser avahiyên leşkerî didomin. Berî şevê komek gerîla êrişî Qereqola Kerboranê (Dargeçit) kirin, 32 leşker hatin kuştin. Wekî din jî qereqolê 7 heb G-3, 4 hezar berikên G-3 yan, roketek B-7 an û fişeka wê, 2 keleşkof û MG-3 yekê bi dest xistin.

Piştî vê êrişê gerîla, hêzên leşkerî yên dewletê ber destî sibehê gundê Çelikaelyêremo-bi firokan bombe kirin, jî gundi-

yan; Zulfer Akkurt, Dikran Kavakçioğlu (70), Mehmet Kavakçioğlu, Alaattin Acar, Fahrettin Acar, Kumri Tosun (80), Elvan û Enver Acar li derveyî gund înfaz kirin. Li Çelê navçeyê Culemêrgê cerdevanek mir, 3 birîndar bûn di şerê bi gerîla re de.

İstifayên cerdevanan roj bi roj zêde dibin. Gerîla her diçe jî bo cerdevan dev ji vê wezîfeyê berdîn, bi awayên cihêreng bi ser wan ve diçe. Çendekî berê li Hewlê (Baykan) jî gundê Çamtaşiyê eqrebayên cerdevanên vî gundî revandibûn li hember vê 37 cerdevan îstifa kirin. Bi vî awayî 48 cerdevanên gundê Exik ku li ser navçeya Motkî ya Bilisê ye îstifa kirin.

Li Bazîdê li ser rîya Gürbulak înceata qereqolekê jî alî gerîla ve bi roketan hate hilweşandin. Li Bismilê nêzikî mezra Salatê gerîla şantiyekê şewitand, li dora 40 milyarî zîrar gihîşt dewletê. 80 milyar zîrar jî bi şewitandina Embara Titûnê ya Farqînê ku gerîla pêk anî gihîşt dewletê.

5 Tirmeh 1993: Çepera operasyonên dewletê li hêla herêmên Botan û Dêrsime dorfireh dibe. Ev heftiyêke bi taybetî li dora quntara çiyayên Gebar û Cudî, dewlet bi hejmareke zêde leşker û firokan bombe dirêşîne. Ji ber ku cihên stratejîk yên di çiya de di destê gerîla de ne, dewlet êrişên xwe bi ser gundên di quntara çiyê de dibe. Di vê navê de cih bi cih gerîla û hêzên dewletê leqayî hev dibin û şer germ dibe. Bi vî awayî gelek leşker tevî Serbazekî (bînbaşiyekî) hatin kuştin, 2 di navbera Dêrsim Pûlûrê (Ovacik) de gerîla avêt ser qereqola gundê Halborî, 2 leşker û 2 tîmên taybetî mirin, gelek leşker birîndar bûn. Li gundê Hoşan ku li ser Xozadê ye jî bi roketavêjan radyolînga PTT'ê şewitandin. Li Pasûrê (Qulp) nêzikî gundê Zeyrekê gerîla rê birî, piştî ku şofêr û karkeran jê peya kirin erebeya şantiyê şewitandin.

Gundê Dandanê (Koyunlu) ku li ser navçeya Rişmilê (Yeşil-

li) yê Mêrdînê ye niha vala bûye. Berî demekê gerîla 7 lêzimên cerdevanên vî gundî revandibûn ji bo ku dev ji cerdevantiyê berdîn. Piştî ku ev her 7 kes hatin kuştin 40 cerdevan çekên xwe li gund hiştin û revayan.

Li navçeya Wanê "Başkale" gerîla û leşker li hev xistin 7 gerîla hatin kuştin. Gerîlayên ku hatin kuştin bi navên xwe yên bernavk ev in: Çekdar (Amed), Rênas (Mêrdîn), Hêza, Welat, Jiyan, Serhildan, Hozan.

6 Tirmeh 1993: Gerîla bombe avêt navenda Amedê. Gerîlayên ARGK'ê li Taxa Şehîtlîkê ya Amedê bombe avêtin lojmanên leşkerî, 2 leşker û 4 kesên sivil birîndar bûn.

Hêzên dewletê navçeyên Licê û Bismilê dan ber gulleyan. Gundê Aşağıören jî ku li ser navçeya Çingûşê ye jî alî hêzên dewletê ve hat valakirin. Piştî ku gund vala kirin mahsûlen gundiyan şewitandin, eşyayên malên wan texrib kirin. Niha gund tevde vala bûye.

Gerîla helikoptereke leşkerî daxiste xwar. Berî vê bi rojekê dema li ser rîya navbera Şîrnex û Qilabanê (Uludere) nasnameyan kontrol dikin, helikoptereke leşkerî mudaxelêyî wan dike, li ser vê gerîla ew dadixe xwarê.

Li Mereşê li navçeya Ekinözü erebeyeke leşkeran jî aliyê gerîla ve ket kemînê, leşkerek mir yek jê jî birîndar bû.

Li ser rîya di navbera Bazîd û Îdirê de li hêla Gevro gerîla rê girt û nasnameyan kontrol kir. Di vê navê de qamyon û erebeyekê jî şewitandin.

Li Şîrnexê jî piştî qedexekirina araqvexwarinê, ERNK Depoya Araqê ya Tekelê ku li Cizîrê ye, şewitand.

Li Mişircê (Kurtalan) leşker mahsûlan, tîmên taybetî jî dikanên esnafan dişewitandin.

Tîman dikanên M. Emîn Yağiz, Hacî Adullah Ünay, Hasan Ünal şewitandin. Li Zoxeydê jî leşkeran zadên gel dan ber agir û ji bo ku careke din nedin hev ew tehdît kirin.

7 Tirmeh 1993: Hêzên dewletê navçeyên Silopî û Dêrikê dan ber gulleyan gelek kes birîndar bûn, 4 kes jî mirin. Piştî ku gerîlayên ARGK'ê li Silopî û Dêrikê avahiyên dewletê bi gulle û roketavêjan texrib kirin û vekîşiyên, hêzên dewletê ketin nav van herdu navçeyan û bêhedef gulle reşandin.

Gerîla bi ser Silopî de girt, li Taxa Yeşiltepe li lojmanên polîsan, "Zirrat Bankasi", Wargeha Hikûmetê û Avahiya Emniyetê gulle raşandin; komserek birîndar bû û avahî tevde xesirîn.

Piştî vekîşandina gerîla hêzên dewletê ku li dor Tabûra Cendirmayan û Qereqola Navendê kom bûbûn, taxên Cudî, Karşıyaka, Harûn, Şehit, Yeşiltepe û Barbaros bêhedef dan ber roketavêjan. Di vê êrişê hêzên dewletê de 2 jê zarok 4 kes mirin.

Li Dêrikê jî piştî ku gerîla bi roketavêjan avahiyên resmî yên dewletê texrib kirin, hêzên dewletê navçeyê dan ber gulleyan. Dikana Şehmuz Güneş Dermanxaneya Mahfuz Kizil û rezên İsmail Ekenek şewitîn. Li seriya 50 kesî jî hatin girtin.

Li hêla Bestler ku di navbera Şîrnex-Qilaban de ye konvoyeke leşkerî ket kemîna gerîla û îmha bû. Dîsa li vê herêmê 15 karkerên daristanê jî aliyê hêzên dewletê ve hatin gullekirin, yek mir, yên din birîndar bûn.

8 Tirmeh 1993: Şer tevî Botan û Dêrsimê li Mereşê jî germ bû. Şerê di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de bi taybetî li gundên Mereşê pêk tî, lê operasyonên dewletê di navenda bajêr de bi giranî didomin. Di şerê li gundên Sinekli û Aşağıçimeler ku li ser navçeya Ekinözüyê ne 8 leşker û cerdevanek mirin, 2 albay û 2 çavîş birîndar bûn. Ev 4 roj in telefonên van gundan hatine birîn û kes jî gund nayên û naçin bajêr. Li Licê dewletê 2 gundên din jî şewitand.

Berî şevêke di şerê gerîla û dewletê de li hêla gundê Seren ku li ser navçeya Licê ye, 2 panzer bi tevahî îmha bûn.

Hêzên dewletê jî bêhedef navenda Licê dan ber gulleyan û gundên Feytê û Hêrê şewitandin.

Gerîla avêt ser Qereqola Cendirmayan ya Tanriyar ku li ser rîya di navbera Bilis û Diyarbekirê de ye, serbazek bi navê Hadî Bayram Şîrnex hate kuştin.

Li Silopiyê dema esnaf serê sibehê diçin ku dikanên xwe ve kin, hêzên leşkerî jî panzeran gulle li wan dirêşandin. Esnafên navçeyê nikarin herin ser karên xwe.

Gerîla li Mêrsinê avête ser şantiya Herêma Pêncemîn, maqîneyên kar, jenerator, tir û şantiyê şewitandin. Bi qasî milyarekî dewlet xesirîn.


Milyarek û nîv jî zerara dewletê li liqa (şubeya) rê ya Cizîrê bû. 3 erebeyên rê tevde şewitîn.

Li Mêrdînê û Agirî tevîhev 40 cerdevan îstifa kirin. Li gundê Mêrdînê Kufêrdel 20, li yê Agirê gundê Zeynel ku li ser navçeya Giyadînê jî 20 cerdevan dev ji vê wezîfeyê berdîn.



û nijad li dij dewletê û nijadperestiyê bi pankartan meşeke gurr pêk anîn.

PÊNÛS



Amed Tigris

Rewşenbîr û Kongreya YRWK'ê

Yekîtîya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê (YRWK) di rojên 26 û 27'ên meha Hezîranê de li bajarê Bonê kongreya xwe ya sêyemîn çêkir. Ji gelek welatên Ewropayê yê cur be cur û ji Kurdistanê qasî 70 nûner beşdarî kongreya rewşenbîran bûn. Nûnerên kongreyê du roj li ser xebatên çûyî û projeyên salên gotûbej kirin û dîtinên xwe pêşkêş kirin.

Di kongreyê de baş diyar û zelal bû ku YRWK'ê di navbera du salên dawî de gelek karên heja dane pêş xwe û hinek ji wan pêk anîne. Di vî warî de gavên herî baş û pîroz, hewildana damezrandina **Înstîtûya Kurdî, Pirtûkxana Neteweyî, Weqfa Çanda Kurdî** û damezrandina **Yekîtîya Mamosteyên Kurd** e. Cihê dilşahi û serbilindiyê ye ku, mirov bibêje YRWK'ê piraniya xebatên resmî, teknîkî û madî ji bo Înstîtûya Kurdî û Weqfa Kultura Kurd tewaw kirin e û niha ji bo wan li xaniyekî digerin. Herwiha îsal li gelek eyaletên Almaniyayê dewleta Alman biryar girtiye ku, zarokên Kurd di dibistanan de bi Kurdî bixwînin. Ji ber vê yekê mamosteyên Kurd bi alîkariya YRWK'ê di kongreyê de biryar girtin ku li bajarê Hamburg, Berlîn û Hanoverê komeleyên mamosteyan çêbikin û ev komele bi navê Yekîtîya Mamosteyên Kurd li Hanoverê bi hevdu re yekîtiyekê li dar bixin. Ji aliyê din ve komeleyên dê û bavên hatinê çêkirin û navên wan Mal-Kom e. Yekîtîya Mamosteyan û Mal-Kom di vî warî de, bi hevdu re xebatê dikin. Îsal bi vekirina dibistanan re li bajarê Hamburgê tenê dê 20 mamosteyên Kurdî dest bi kar bikin. Ev ji bo Kurdên li Almaniyayê fersendeke gelek mezin û girîng e. Pêwîst e ku dê-bav, hemû komeleyên Kurdan û mamosteyên zimanê Kurdî dest bidine hevdu. Ev ne bi tenê ji aliyê perwerdeya Kurdî ve her wiha ji bo prestîja Kurdan jî gaveke gelekî heja ye. Kurd her ku diçe wekî netewe xwe bi xebat û têkoşîna xwe li welêt û derî welêt didin qebûlîkirin. Zarokên Kurd divê li Almaniyayê ji asimilasyona Alman û Tirkan rizgar bibin. Şexsiyet û nasnameya xwe ya Kurdî bigirin.

Di kongrê de destûr hat guhartin. Bi dîtina min destûra kevin ji bo xebatê ne vekirî bû. Aliyê navendî bêhtir bû. Di ya nû de giraniya xebatê dikeve ser şaxan (şubeyan). Her şax dê ji xwe re li gor şertên welatê ku lê ne, destûr çêdikin û gor wê xebata xwe bimeşînin. Bi destûra nû re bîrpirsiyarî û karê her kesî jî diyar û zelaltir bû. Lê dîsa jî ev tîr nake. Divê di kongreyê de mirov li ser destûrê baş gotûbêj bike. Ji bo efektîvkirina xebata YRWK'ê divê navend here Berlîn an jî Stockholmê. Ji ber ku li Bonê zêde kesên ku bi kar û barên YRWK'ê dakevin kêmin. Dema Komîta Navendî ji 3-4 mehan cêrêkê bicive wê demê kar nameşe. Ji ber ku her yek li welatê ye. Endamên Komîta Navendî dema yek li Stockholmê, yek li Berlînê û yê din jî li Paris û Bonê bin, wê demê di pratîkê de kar nameşe.

Divê ji bo endametiya endamên YRWK'ê jî pîvanek hebe. Her kes nikaribe bibe endam. Di warê ziman, kultur an jî huner de hinek berhemên wî/wê hebe ku bikaribe bibe endam.

Kêmasî û çewtiyêke din jî di kongreyê de xwe nişan da ku ew kesên ku bi Kurdî nizanin wekî nûner beşdarî kongreyê bûbûn. Bi dîtina min nûnerên kongreyê pêwîst e ku bi Kurdî bizanibin. Ew kesên ku bi Kurdî nizanin divê wekî nûner beşdarî kongreyê nebin. Helbet ew hevalên heja ne, lê bi Kurdî nizanin. Ew kesên wiha dikarin li derî YRWK'ê li nav hinek rêxistin û cihên din kar bikin. Ez bawer im ku, dê li wan deran feyda wan bêhtir bibe.

Her nûner ji welatêkî tê. Ji ber vê yekê ew hevdu baş nas nakin. Divê berî kongreyê bi kêmasî rojêke wan a vala hebe ku bi hevdu re sohbet bikin. Hevdu nas bikin ku bikaribin bi hevdu re bixebitin!

Kêmasî û çewtiyêke din jî di kongreyê de xwe nişan da ku ew kesên ku bi Kurdî nizanin wekî nûner beşdarî kongreyê bûbûn. Bi dîtina min nûnerên kongreyê pêwîst e ku bi Kurdî bizanibin. Ew kesên ku bi Kurdî nizanin divê wekî nûner beşdarî kongreyê nebin. Helbet ew hevalên heja ne, lê bi Kurdî nizanin.

Li Bakur hozanî û bazarvanî

Selîm Biçûk

Talankirin û dizîya li ser çand, tore, ziman, wêje û folklorê Kurdî ji sedan salan ve didomin. Ewrên dagirkeriyê yê reş û tarî, bi yek carê rê li pêşberî spîtahî û ronahiyê girtibûn. Bi hemû dirindî û hovîtiya xwe ve gelê Kurd dibin reşahiya bindestiyê de hiştibû. Serxak û bînxak û hemû buhayên daringî (madî) û giyanî (manewî) li ber bahoza talan û wêrankirinê diçû. Lê wêjevanekî Ereban bi nav û deng dibêje:

Ger rojêkê jiyane bixwaze gel
Bêçare dê bersivê bide qeder...

Va ye gelê Kurdistanê bi hemû hîm û heza xwe jiyaneke birûmet dixwaze. Bi xwîn û xwêdanê rîya hebûn û hatina xwe vedike. Êdî qedera ku heta doh tarî û bextreş bû diguherîne. Bêçare dimîne ku hin tîrêjen ronahiyê dirêjî jiyana me bike û li benda vekirina deriyê heviyan raweste. Lê Ahraman bi xweşiya xwe rê nade "Ahor Mezda" şerxwazî rê nade aştxwaziyê. Dijminê me jî, ji bo hilhatina roja me dereng bihêle, di her hêlê de xwe daye şerekî bi qirêj û hovane. Ev şer mîna hemû meydanên jiyane di meydana huner û hozaniyê de jî bilind û geş bûye.

Li bakurê Kurdistanê dewleta dagirker di bin lêdanên şervanên azadiyê de qedexekirina ku ji sedan salan ve li ser zimanê Kurdî bû rakir, pê re derxistina qasetên bi Kurdî serbest kir. Di vî meydana dawî de dewletê meydanê fireh ji bo firoşvan û bazarvanên hozaniyê vekir. Lê ji bo wê jî, (ji bo dewletê) zemîneke tund bû ku şerê taybetî tê de geş bike û dîsa mîna berê, lê bi awayekî din bidîzî û veşartî hem muzîk, ziman, folklor û helbestên me talan û wêran bike hem jî, li dijî şoresê geş bike. Ji dema ku stranên Kurdî serbest bûne û heta îro jî heja hozan û dengbêjan ve hejmareke bilind qaset derketine û hîn jî tenê weşandin. Lê xwezî bi qedexekirina berê û ne bi talankirina ku niha hozanvanî di navbera bazarvanî û nokeriya dijmin de jar û perîşan ketiye. Hê jî hozanê durist ji ber vê rewşê şerm dike bibêje ez hozan im. Ez bawer dikim ku tu cudahî di navbera wan

hozanên ku bizanebûn an jî, bi nezanî destdirêjahiyên li ser muzîk û stranên Kurdî dikin û dibin destek ji bo şerê taybetî û navbera wan cerdevan û nokerên ku bi çekên dijmin xwîna şervan û welatparêzan dirijînin nîn e. Na çî tu mirovekî bikujî û çî tu buha û nirxên ku bi mirinê parastine bikujî.

Min gelek qasetên ku şûna xwe di firoşgeha bazarvanî û nokeriyê de girtine guhdar kirine. Di van qasetan de sê cure xerabkirin hene:

1. Helbest û stranên şoresgerî û gelparêzî ji naveroka wan vala dikin. Her wiha ev stran bêtam û wate (mane) dimîne. Armanca vî cureyî ew e ku, hikariya van helbestan li ser gel tune bike. Di vî awayî de bi tenê muzîka helbestê dimîne, lê dengbêj çî dibêje, stran çî ye û li ser çî dibêje kes nizane. Ev awayê xirabkirinê rastê rast bi tiliyên MÎT'ê bi rê ve diçe. Ev jî, şeweyekî nû ye ji şerê taybetî piştî serbestkirina ziman û stranên Kurdî derket ber çavan.

2. Di vî cureyî de dest dirêjahî li ser bêjeyên stranê dibe û ziman dibe armanca xerabkirinê. Ev şewê bêhtir ji heja hozanên ku bi Kurdî nizanin tê bi rêvebirin. Hozanekî ku "Av" û "Bav" ji hev nas nake xwe berdide meydana hozaniya Kurdî û bi kêfa dilê vî zimanê şîrîn ser û binî hev dike gul û kulîlkên wî diperciqîne û dike meydana listik û destdirêjahiyên. Di qasetekê de di şûna "pêjna te nayê" bejna te nayê, tê gotin. Her wiha di yekê de, di şûna qedir, qeder tê gotin û bi sedan nimûne hene. Qewetiya me ji bo vî cureyê hozanan. Heger tu hozanekî Kurdî di serî de pêwîst e tu bi zimanê Kurdî baş bizanibî. Lê eger tu bazarvan î, sir û pîvazan bifiroşe, ji ber ku mafê te nîn e tu bazarvaniyê bi ziman û çanda 40 milyon mirovî bikî. Lê dema ku ev tişt bi zanebûn bê kirin jî, em bêçare dimînin ku bibêjin: Tu noker û ajan î. Di vê rewşê de helwesta gel li hember van kesan jî kifş e û Xweda zezeba millet bi ser serê kesekî de neyîne.

3. Ev cure ji hozanên me bi stran û helbestên xwe dikevin xizmeta şerê taybetî. Di vî hêlê de, em dikarin navê hozana delal xwişkê Ayşe Şan bînin ziman.

Her ez çiqasî hez ji dengê wê dikim jî, lê rastî çiqasî tal be jî, gerek e were ziman. Ayşe Şan di helbesteke xwe de bi kîneke bêsinor êrîşî ola êzîdî dike. Helbest bi xwe ne li ser êzîdîyan be jî, hozana me, yê ku helbest li ser hatiye gotin vedigerin ser binyat êzîdiya, ji ber ku tu tiştî ji vî olê piştir û dîrî mirovahiyêtir nabîne û rengê piştir nabîne ku li vî mirovî bike. Ev helbest di demeke ku gelê Kurd li xwe hişyar bûye û nakokiyên olî avêtine piştî gûhan tê gotin. Belê, ev êzîdî ye, ev sunî ye, ev elewî ye, ev fileh e, ev cihû ye, di Kurdistanê de hew cihê xwe digire. Ew bilûra ku dijmin pê digot, şikest û êdî nema dikare gelê Kurd parçe bike. Takîka (parçe bike, bindest bike) demê li ser xwar û vexwar. Bi saya tevgera rizgariya neteweya Kurdistanê ya nûjen hêdî di eniya neteweyî de yekgirtina gel ku hatî afirandin tu hêz nikare wê bilerizîne. Baweriya olî çî dibe bila bibe, lê Kurdperwerî di ser her tiştî re ye. Êzîdî, elewî, sunî, xiristîyanî, cihû... Tev di yek kozîkê de şerê yek dijminî dikin û ji bo yek armanç û heviyê xwînê dirijînin. Hozanî jî pêwîst e û xizmeta wê yekîtiyê de be, an nexwe bi navên din dê bê naskirin.

Hozana me ji ber nezaniya xwe bi dîroka Kurdistanê careke din dikeve şaşiyêke mezin ku êzîdîyan digihîne Yezîdê kurê Mawîye û Merwanê Emewî. Êzîdî û ev kes mîna erd û ezmanan ji hev dûr in. Têkiliya ku dike navbera wan û êzîdîyan neheqiyêke mezin e li ser Kurdên êzîdî. Em careke din dibêjin, ji bo ku mirov ewqasî di gotinên xwe de erzan nebe pêwîst e tiştên ku li ser distire baş nas bike. Êzîdîyan ne tiştêkî hindêk kirine ji bo Kurdayetî li ser piya bimîne. Bi mirinê çand, tore, ziman û dîroka Kurdî parastine.

Ev şerê ku li ser hunera Kurdî tê birêvebirin, barekî mezin dide ser milên hunermend û hozanên welatparêz. Li dijî sextekariya ku hozaniyê bi ser bazarvanî û ajaniyê de dikîşîne, di her hêlê de pêwîst e eniya hunermendî xwe bi hêz bike. Girîng e rê li pêşberî wan kesên ku ziman, çand, huner û helbestên Kurdî ji bo xwe dikin destekeke diravî bê girtin.

Hejmara şeşemîn a Nûdemê

NÛDEM

№ 6 1993

Kovara hunerî, edebî û çandî ku li Swêdê tê weşandin, hejmara wê ya şeşemîn derket. Di vî hejmara dawî de kovar cih daye nivîs û mijarên cihêreng. Nûdem ji bo rewşa enstîtuyên Kurdî ya li Paris, Stenbol û Brukselê bi xwendevanên xwe bide zanîn, bi Kendal Nezan, Serokê Enstîtuya Kurdî ya Parisê, F.Huseyn Sagniç, li ser navê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê û Derwêş M. Ferho, Sekreterê Enstîtuya Kurdî ya Brukselê re hevpeyvîn çêkirine.

Mehmet Uzun li ser "Resamê Rengên Têkel ên Kurdî Hiner Selîm" rawestiya ye, Rohat di vî hejmarê de jî bi gelek çavkaniyan mijara "Di destanên Kurdî de berxwedan û serdestiyek jinan" hildaye destê xwe. M. Mayî li ser "Rola Edebiyatê di pêşketina miletekî de" sekiniye. Haviz Qazî bi muzîsyenê Kurd Dîlşad re hevpeyvînekê çêkiriye. Xwedî û Bîrpirsiyarê Giştî yê Nûdemê Firat Cewerî, ji edebiyata cihanê di vî hejmarê de Madmazel Claude ya Henry Miller, Şahîne B. Soreklî jî Mîrê Biçûk a Antione de Saint-Exupéry wergerandine Kurmançî.

Zeynelabidin Zinar ji şairên klasik ên Kurdî Pertev Begê Hekarî dide nasîn. Ji helbestvanan jî ku em çend navan bidin Rojen Barnas, Ömer Okumuş, Mervanê Keleş, Bedîrxan Epözdemîr û hwd. di vî hejmarê de cih standine.

Bi hunermend Xelîl Xemgîn re hevpeyvîn

'Hunermend mîna mûmê ye'

Her çi qas xwendevanên me we nas dikin jî, me dixwest hûn bi kurtî behsa xwe û xebatên xwe yên dawî bikin.

- Di sala 1955'an de li başûrê rojavayê hatime dinê. Ji ber xizantiya malbata xwe, min nekarî xwendina dibistanê tamam bikim. Min karê hunermendiyê, cara yekemîn ji bavê xwe stand. Bavê min ne dengbêjekî mezin bû, lê hin stranên gelêrî dizanî û bi dengê xwe yê zelal ew digotin:

Di sala 1971'an de min hêdî hêdî dest bi karê hunermendiyê kir. Ji ber bêderfetiye, wek pîrrianiya hunermendên Kurd min jî bi amatorî karê xwe yê huneriyê domand. Di sala 1975'an de li ser perwerdebûna dengên muzîkê, min dest bi dibistanê kir. Lê mixabin, dîsa ji ber bêîmkaniyê min ew neqedand. Di sala 1978'an de, bi nasdariya min a bi têkoşîna rizgariyê re, di mercên nû de min karê huneriyê domand. Sala 1985'an jî, ez derketim derveyî welêt û li Ewropayê, di nav HUNERKOM'ê de min xebatên xwe berdewam kirin, hê jî ez bi HUNERKOM'ê re me.


Hûn bi tevahî muzîka Kurdî çawa dinirxînin û pîrsgirêkên ku hene bi dîtina we, dê çawa çareser bibin?

- Di warê hunera Kurdî de li van 15-20 salên dawî hin guhertinên hêja çêbûn. Lê bêguman pîrsgirêkên ku di huner û zimanê Kurdî de hene, hîna çareser nebûne. Çareser-

kirina pîrsgirêkan girêdayî rewşa rizgariya neteweya me ye. Ger ev pîrsgirêk çareser bibê, hemû pîrsgirêkên din wê bêt çareserkin. Bi dîtina min ev tiştêkî bîngêhî e. Lê ez dixwazim vê jî bibêjim ku di van salên dawî de nîrxên gelê me yên hunerî, çawa ku ji aliyê dewletên dagirker ve tînan talan kirin, pîr mixabin bi destê gelek hunermendên Kurd, di bin navê Kurdaiyê, bêyî ku taybetiyên huner û çanda gelê me bifikirin, tînan dejenerekirin. Gelek hunermendên ku îro derketine holê, orîjînalîteya muzîka Kurdî winda dikin. Heta ji wan hunermendan, li hinekan guhdarî dikim û pê derdixim ku zimanê Kurdî nizanin, lê muzîka Kurdî dibêjin. Ew di jiyana Kurdî de nejiyane û jiyana gel baş nas nekirine. Ji xwe re dibêjin: 'Ez dixwazim muzîka Kurdî ya modern çêbikim.' Di bîr û baweriyê min de, ew xwe ji hunera Kurdî berpirsiyar nabînin. Ew heyrana nav û dengên xwe û keşbûna xwe ne. Li aliyê din, li holê rewşeke wisa heye ku ev jî teqlîtkirina muzîka dewletên serdest e.

Li gor dîtina we, muzîsyenên Kurd, li gor mercên îro bersiva demê didin an na?

- Ez berê dixwazim wiha bibêjim: Gotina 'muzîsyen' gotineke mezin e. Lê mixabin wekî Yaşar Kaya jî gotî: "Dengbêjen Kurd hemû bi amatorî vî karî berdewam dikin." li welatê me, ne dibistan ne jî avahiyan ku muzîk û hu-



Hunermend Xelîl Xemgîn bi şanoger Amele (li çepê) re tê dîtin.

nera Kurdî bi pêş xînin hene. Ji ber vê yekê, hejmara muzîsyenan li Kurdistanê gelek kême e. Di baweriyê min de, muzîsyenên Kurd di mercên îro de bersiva demê nikarin bidin. Sedemeke vê jixwe me li jor da xuyakirin. Ya din jî ew e ku, li gor mercên îro hunermendên Kurd hîn ne hatine tevgerkirin.

Pêwendiyên navbera muzîsyenên Kurd çawan in?

- Li gorî mercên îro pîr qels in, lê dîsa jî ji yên berê çêtir in. Di dîroka Kurdan de, kême hunermend hatine cem hev û bi hev re kar kirine. Em îro dinêrin ku di warê têkoşîna

neteweyî de hêdî hêdî avahiyan hunermendiyê jî tînan damezirandin. HUNERKOM yek ji van avahiyan e.

Bi giştî rola mirovekî hunermend, bi taybetî jî ya yekî muzîsyen divê çawa be?

- Di têkoşîna neteweyî de rola kesekî hunermend gelekî girîng e. Divê ku hunermend xwedî kesanetiyeke pîr zelal be. Hunermendekî ku hemû derd û êşên civaka xwe di dilê xwe de bi cih neke û nebe xwediyê hemû van derd û kulana, bêguman nikare hunermendiya civaka xwe bike. Mirovê hunermend bi hal û hereketên xwe, bi tîkilî û danû-


tandinên xwe di nav civakê de nimûne ye. Hunermendî, wezîfeyê girîng û dijwar e. Ez bi kurtî bibêjim: mirovekî hunermend mîna mûmê ye. Ew bi xwe tê şewitandin, lê bi şeweta xwe re ronahiye dide derdora xwe.

Daxwazî û mesajên we.

- Bi taybetî ji gelê Kurd daxwaza min ew e ku, zarokên xwe bi zimanê Kurdî mezin bikin. Ji bo rojnameya Welat jî serkeftinê dixwazim û hêvîdar im ku di pêş de naveroka Welat dewlemendtir bibê. Spasiya xwe diyarî we hemûyan dikim.

Hevpeyvîn:

Bêrivana Dêrsimî



Mamê Rîşe Helloyê Germiyan

Di têkoşîna Kurd a li hember dijmin de gelek caran mirovên mîrxas û qehreman derdikevin. Navê wan deng dide û dibê destana li ser zimanê xelkên rênçber û karker, dibê tirs û xofa dilê neyaran.

Yek ji wan lehengên bi nav û deng Mamê Rîşe ye ku şairê mezin Şerko Bêkes navê wî bi Helloyê Germiyan* dide nasîn. Mamê Rîşe, têkoşerekî rind ê ji başurê Kurdistanê bû.

Li gel destpêka Şoreşa Nû ya piştî 1976'an, çekên xwe hilgirt û li dora bajarê Kerkûkê ji bo rizgarî û azadiya gelê Kurd li hember dagirkeran dest bi jiyana têkoşeriyê kir.

Navê Mamê Rîşe, di wê demê de wek efsane kete ser zarê hemû xelkê û gelek ji xortên Kurd bi seba wî dibûn pêşmerge. Gelek leşkerên dijmin jî, ji tîrsa navê Mamê Rîşe, ji Kurdistanê direviyan.

Mamê Rîşe xwestiviyê hemû xelkê rênçber bû, navê wî di zarê xelkê de bûne destan û gelek ji wan destanan heya îro jî, ji aliyê gel ve tîne gotin. Mamê Rîşe di roja 25.1.1984'an de şehîd bû.

Heta roja mirinê jî, ew bi xwe li hember dijminê kedxwar çek dananiye. Navê Helloyê Germiyan, li dîroka Kurdistanê ya nû bi xwîn hatiye nivîsandin.

Hello: Baz

Rûpelek ji dîroka Mezopotamya

Hans Hauser

Werger: Borzoo, S.D.

Di sala 401'ê berî zayîne de nêzîkî gundê Kûnaxsa di hundirê welatê Babilon de şerekî mezin di navbera Erdeşîrê Sisêyan û birayê wî Kûî yê biçûk ji Silsileyê Hexamenîşî de diqewime, ku bi şikî û kuştina Kûrûş tamam dibe. Pirraniya leşkerên Kûrûş ên di vî şerî de, ji Yewnanên ku ji bo pereyan şer dikirin, hatibûn saz kirin.

Piştî şikîna wan, bi dehhezaran ji leşkerên Helenan (Yewnanan), ku di şer de sax mabûn, kar û barê reva xwe ji ber qehra Erdeşîrê dikin. Di hinek kemînen Farisan de. Serleşkerê wan Klêarxos û gelek ji, ji berpirsiyarên leşkerî yê heja tèn kuştin.

Ksenefon dîroknivîsê Helenî ku di wê demê de, di nav wan de bû, dibe serleşker. Di civîna şevkê de biryar tê girtin ku ew hemû çadirên xwe yê leşkerî û tiştên giran ku çûyîna wan bi derengî dixê, bişewitînin û tenê silêhên xwe û tiştên sivik di gel xwe bibin.

Bi pergal û tedbîrên leşkerî û di bin êrişên Farisan de, hêdî hêdî di tenîştê Çemê Dicle de, ber bi hevraz dimeşin. Piştî meşa bi heşt rojan ji gundê Kûnaxsa ji nişka ve, çiyayên bilind û şaxên asê derdikevin pêşiya wan. Di çiyayên dor û bera wan de, ji nişka ve agir tê vêxistin û pîrr deng tèn bihîstin ku gazî hevdu dikin. Wergerên di gel Helenan dibêjin ku ev çiya herêma gelê Kardûx e, ku gelekî şerker û mîrxas in û heya niha neketine bin destê şahê Persan û tu caran serê xwe li ber tu hikumdarî netewandine. Dîsa werger dibêjin: "Carekê şahê Persan (Îran) 120 hezar mirovî ji leşkerên xwe ji bo bindestkirina wan dişîne, lê yek ji wan sax venagere."

Ksenefon dinivîsê: "Dema ku serokhêzên leşkerî vî tiştî (van gotinan) dibihîzin, di nav wan de perîşanî û sergerdanî derdikeve holê."

Di çend rojên dawî de ku di ser wan re derbas dibin, tê xuyakirin ku Kardûxên "barbar" ji gelekî ne, ku nişana wan hovîti û serhişkiya wan e.

Bi rastî jî ewên ku "Gazî û dengên me nedixwestin bibihîzin û tu nişanên dostaniyê ji xwe nişan nedidan" karibûn stratejiya nav û deng ya leşkerên Helen di wê demê de li nav hev bixin û "Ew di şer û êrişên xwe yê li dû hev de, zêdetir serêşî û nerehetî dane leşkerên me ku leşkerên Şahê Îranê û serdaran wî bi hev re nedabûne me."

Ksenefon dinivîsê: "Heger di wê demê de, hejmareke zêde ji wan komî ser hev bûbûna, em di xeterê de bûn ku hejmareke zêde ji leşkeran, telef bibin."

"KENTRÎTES Û BOTAN"

Di dawiyê de, leşkerên Helen

di roja heftan de piştî pîrr zehmet û westandin digihin ber Çemê "Kentrîtes" ku sînorê Kardûxan û Ermenîstanê bû. Ew bi manewreyeke pêkhatî û heja xwe li Çemê Kentrîtes dixin û derbasî axa Ermenîstanê dibin.

Ev serpehatiya bi heyecan ne tenê ji bo gotûbêjêke dîrokî zor girîng e, her wiha şan e (şahidek e) ji bo cografînasiya gelên çiyayên ên Kevin. Niha êşkere ye ku, welatê Kardûxan welatekî biçûk bûye ku di tebteta xwe de keleke mehkem li dijî Ermenîstanê bûye.

Bi giştî û bêşik ev tiştê ji bo dagirkerên Kurd û Kurdistanê xebereke zor nebaş bû, dema ku

tîk) de wek hev in, ew ji yek kokê ne jî.

Di van herdu bêjeyan de tîpên bêdeng (konsonant) ên "k-r-d" li dû hev tèn. Ev tîpên dengdar weke dendikeke hişk çend hezarsal di van navan de dimînin, lê tîpên dengdêr (vokal) yan xwe diguhêrin an jî, ji navê radibin.

Guherîna dengî ya bêjeya "Kard" bi "Kurd" yan jî "Kord" bi şeweyekî dû hev hatine parastin.

Tê zanîn ku bêjeya "Kardû-xîên" ya Kevin di Aramî de "Beth-Kardû" di Erebi de "Bakarda" hatiye bi navkirin.

Di nivîsên Ermenî de "Cordu-

bi xwe jî şerkerên netir û mîrxas in, lewre heya niha bi biyaniyan re danûstandina wan çênebû ye."

Tîmên Meqdûnî (Mazêdunî) ji leşkerên Aleksandir ku ji bo şerên çiyayên hatibûn terbiyekirin û di taktîkên şerên gerîla de zanebûnên wan hebûn, diçin ser Kossêran. Şerekî zor dijwar di navbera wan de dest pê dike. Tê gotin ku di vî şerî de ji bo bihus- tek erd pîrr kuştî û birîndar ji herdu aliyayê çêdibin. Piştî çil rojên şer, berxwedan, kuştin û dîlgirtin, serokên Kossêran tene rê û xwe teslîm dikin.

Dema ku ev qomandoyên leşkerî bi vî awayî diqedin, Aleksan-

leşkerî de bide xuyakirin.

Di der û dorên sala 1600'î (B.Z.) de, Hêftî di bin serokatîya Mûrsîlisê Yekan de êrişî Mezopotamya dikin, leşkerên Babîlonîyan dişkinin û xezîna dewletê giş vala dikin û di gel xwe dibin. Van bûyerên leşkerî di dîroka bajarekî hezar salî de, tu bandoreke (tesîreke) wisa zêde nebaş di jiyana wan de peyde nedikir.

Lê hebûna stûna pêncan di bajêr de, yanê Kassiyên eşîrên şerker ku ji demeke dirêj ve li bajêr kar dikirin û mirovên milayim, mezlûm û aşîxwaz dihatin xuyakirin, ji nişka ve har û hov dibin. Silêhên xwe yê ku di kongan de veşartibûn, derdixin derve. Êrişî avahiyên bajêr dikin, hemû avahiyên dewletê, avahiyên gel û malên olî talan dikin, kevîreki li ser kevîreki nahêlin.

Kêf, kêfa wan e.

Gazî Kassiyên wehşî (hov) ên çiyayê jî dikin.

Ew jî wek morîstangan ji çiyayê tene xwar (tene bajêr).

Ji nişka ve dibin xwedanê bajarekî ewqas mezin ku, wan di xewna xwe de jî nedîtibûn.

500 salî Kassiyên rû çermkirî (di ser rûyên xwe de çerm berddan) li vî derê hikum dikin. Hêdî hêdî hîni çanda Mezopotamyayê dibin. Navên xwe, navên bav û bapîrên xwe bi alfabe ya mîxî li ser herîya kûzan dinivîsin, ku piştî şewitandinê (di kûran de) ew êdî xera nedibûn. Serokên wan ji xwe re digotin: "Padişahên Babîlon, Kaşû û Akkad." Ji dewleta herêma bin destê xwe re digotin: "Kardûnaş" (Kardunasch) Tîpên "k-r-d" çawa di bêjeyên "Kardûx" û "Kurd" de hebûn, di vî bêjeyê de jî hene. Ev sê tîpên neteweyî û dengî (Anthropo-Phonetisch) weke sê xalên ronak (rewşen) her û her di neynika radara netewnasîyê de, li vî herêma Mezopotamyayê tene ber çavên me.

Dema padişahiya Kassiyayê li Babîlonê, demeke li tevîhev û pîrr di tariyê de maye. Ji ber ku piştî şikî û hilweşandina wan di sala 1170'î (B.Z.) de, hemû sopp û nişanên wan, bi sedema zordariya wan li ser gelên vî herêmê, hatine windakirin.

Tenê di dokumentên arşivkirî yê diplomasiya dema Firewênê Misirê de, ew ên di sala 1887'an de li Amarnayê hatine peydakirin, tê xuyan ku beşek (qismek) ji malmezînen wan ji nijadê (neslê) "Îndo-Îranî" bûne. Ev tişt bi taybetî ji bo padişahê pêncan yê Kassiyayê dikare bê gotin. Navê wî Abîratta ye, ew nav jî navekî Arî ye. Di vî navî de oldariya wan jî tê xuyan ku, di wî de xwedayên Hindîstana Kevin (qedîm) wek Sûriya, Marut û Bûriya roleke mezin dilîzin.

Gelo di cih û warên Kassiyayê de îro kî rûdin? Ma ne Kurdên Mukrî ji rojhilatê Kurdistanê ne, ku heya niha jî bi şiveyê Kurdiya Avêsta diaxivin?!



lêkolînanên sedsala bîstan di bêjeya "Kardûx" de xelegeke zîncîrê di koçberîya gelan de ji herêma Qefqasiyê û nişaneke zor girîng di Kurdkirina (Kurdûna) herêma Dicle ya rojhilatê de dîtine.

Lehmann-Haupt ku lêkolînan xwe li ser Ermenîstanê pêk anîne, rêka hatina dehhezaran leşkerên Yewnanan bi diqet teqîb dike (rêka wan dide ber xwe) û digihîje vî netîceyê: Ew cihê ku leşker tê de dikevin nav çiyayê, ew cihgahê ku îro gundê Mansûriyê ne dîrî navçeya Cizîreyê niha ye. Çemê "Kentrîtes" jî bêşik Çemê Botan-Sû ye ku ji şaxa rojhilatê Dicle çêdibe.

Ev serpehatiya Yewnanan, dîroka gelekî di herêma çiyayên Tauro-Zagros de derdixê holê ku heya demekê di valahiyê de mabû û dide îsbatkirin ku, ev çiyayên di nîveka yekhezaran saliya berî zayîne jî qewmên îro (Kurdên îro) ve jî yek neslê ne û di van cihan de jîya ne. Ev îsbat ne tenê ji sebebên cografî û xisletên eşîretî yê vî herêmê tèn, vî tiştî lêkolînanên fakulteyên Filolojî jî rast dibînin.

Bi dîtina lêkolînanên zîmanan bêjeya (peyva) "Kardûx" û "Kurd" ne tenê di deng (fone-

ene" an jî "Kordukh" û di Tirkî de "Kordi" hatiye gotin.

KARDÛX KÎ NE?

Gelo ev Kardûx jî hêla qewmî ve kî ne? Gelo ev, ew mirov in ku di dema Antîk de, di basikên çiyayên di tenîştê destên welatê Tewratê (kitêba Mûsa) de cih girtibûn? Çawa ku "N.J.Marr" yê Rûsî texmîn dike? Gelo ev koçberên demên din in ku, ji rojava an jî, ji rojhilatê Asya hatine?

Bersiva van pîrsan zor dijwar dibû, heger careke din şerekî mezin û dîrokî di navbera Yewnanan û Persan de pêk nehata.

Sedsal piştî bûyera "Kunaxsa" serbazên Aleksandirê Mezin li herêma bindestkirî ya welatê Maddan mecbûr dibin careke din li dijî hinek eşîrên çiyayên Zagros bikevine cengê, ji ber ku rê li ber alîkariya piştî cebhê ji Yewnanîstan û Babîlonê jî aliyê wan eşîran ve hatibû qutkirin. Wan berê jî nehiştibûn leşkerên şahê Persan di vî herêmê re derbas bibin. Gelo ev kî ne? Ev çî mirov in ku heya niha pêşî li du leşkerên wek behran girtine? Ew Kossêr (Kossäer) in. Mîrxas û cengawerên eşîrên koçer in ku bi gotîna Diodor: "Ji ber ku herêma wan bilind û çiyayên asê ne û ew

dir ne tenê karibû bi dirêjeya şer heya heft rojan herêmeke fireh ji axa dijmin ji bo leşkerên xwe bide parastin, wî bi vî karî dîroka nêzîkî duhezarsaliya eşîrên van çiyayê di demên borî (derbasbûyî) de jî anî pêş çavan.

KASSÎ AN JÎ KASSÛ


Kossêr (Kossäer), Kassî an jî ew gel e ku silsileyên Hamûrabî ji Mezopotamyayê jî ew nas kirine.

Duhezarsal berî zayîne, aborî (ekonomî) û senetê metropolên welatê Babilon ewqas bi pêş ve çûbû ku, bîyî alîkariya karkerên biyanî nikaribûn aborî û senetê xwe li ser lingan xwedî bikin. Karên sivik ên dukandarî, esnafî û bazerganî di destên xwe de hiştin û hemû kar û xebatên zor û giran, pîs û gemar (wek Tirkên îrî li Almanayê) dane wan biyaniyan ku ji qewmên cîran hatibûn. Pirraniya van biyaniyan ji rojhilatê çiyayên "Arafa û Êlipî" û ji herêma welatê Kassû hatibûn.

Hezaran ji mirovên van eşîrên şerker di karê çandinî (zîraet), daristanî, avahîsazî û barkêşiyê de kar dikirin.

Ev rewşa siyasî-aborî çend sedsalan bi vî awayî dom dike. Lê sistemeke wiha çiqasî xurt an jî jar e, dikare xwe di bohraneke

Dilşad Merîwanî



Dilşad Merîwanî



Şîrîn K.

Dilşad Merîwanî, hozanvan û nivîskar, di sala 1947'an de li bajarê Silêmaniyê ji dayika xwe bûye. Sala 1972 xwendina zimanê Kurdî li Zanistgeha Bexdayê kuta kiriye. Gelek berhemên torevanî yên giranbuhar berhev kiriye wergerandiye û afirandiye. Dilşad di roja 12.2.1989'an de li Silêmaniyê ket girtîgehê hat girtin û di roja 13.3.1989'an de bi destê dijmin hate kuştin. Şîrîn K. pîreka Dilşad e, niha li bajarê Silêmaniyê rûdine, ew jî nivîskar e, sê zarokên wê hene; Sîva (13 salî), Roza (9 salî), Lola (5 salî), Lola bavê xwe nediyê.

Niwa Hebîb

Xeribe! Mirov derfeta qehîrîne çawa bi dest dixê di wê demê de ku hemû jiyana wî tîrî evîntiyê nake.

Hemû wêjedostên Kurd li başûrê Kurdistanê vî navî dinasin, torevanekî (wêjevane-kî) rêzdar, birûmet û nîştîmanperwer, di temenê 42 salî de bi destê dijmin hat kuştin.

Dilşad Merîwanî, mamos-teyê zimanê Kurdî bû li bajarê Silêmaniyê. Rojekê ji xwendekarê xwe re dibêje, "Heger hûn bixwazin ez dikarim nivîsîna Kurdî bi tîpên Latîni hîni we bikim." Xwendekarê wî pîrê kêfxweş dibin, hemû bi hev re dikevin doza hînbûna tîpên Latîni. Piştî çend rojan mamoste Dilşad tî girtin û wî wîndî dibe.

Di van 20 salên dawî de hejmareke mezin; zanyar, hunermend, nivîskar, wêjewan û rojnamevanên xebatkar hatin kuştin, mîna:

Salih Yusifî (1979) Rojnamevan

Cemîl Rencber (1981) Hozanvan

Yusif Dergeleyî (1982)

Nivîskar

Qadir Kaban (1983)

Stranbêj

Abdulxaliq Merûf (1984)

Zanyar

Şakir Fetah (1988) Nivîskar û Torevan

Kuştina van nivîskaran tenê bi nîştîmanperweriya wan ve girêdayî ye. Gelek nivîskarên din jî hatin kuştin, ketin zindanê, bi dehan rojnamevan û nivîskar berê xwe dane derveyî welat û derbeder man.

Rejîma Sedam, gelê Kurd mîna dijminê xwe dibîne û dinase, di şeveke sala 1982'an de 8 hezar mirovên Berzanî hatin dilgirtin û wîndî bûn, di rojê meha Adara sala 1988'an de 5 hezar mirov li bajarê Helebçeyê hatin kuştin, di navbera bihar û havîna sala 1988'an de 200 hezar Kurdên din li Enfalê hatin dilgirtin û ew bi zindeyî xistin bin axê û gelekên din jî. Bi vî awayî di navbera salên 1968 û 1991'an de dijmin şerê qirkirinê li hemberî gelê Kurd ragihandibû.

Gunehê van kuştîyan tiştên gelek biçûk in, tenê ew e ku Kurd in, naxwazin bibin amûrê destê dijmin û mîna pezê gêj bijîn.


Piştî serhildana sala 1988'an dokumanên dijmin tev ketin destê gel û dosya Dilşad jî di nav van dokumanan de bû û tî de ev tişt hatibûn nivîsîn: "Ev gunehkar bîrên (ramanên) şovenîstî û cudahiyê li nav xwendekarên xwe diweşand û tîpên Latîni hîne xwendekarê xwe dikirin, ji bilî wê jî ev gunehkar berî niha pêşmerge bûye. Ji ber van sûcan me Dilşad Mihemedemîn Fetah Merîwanî di roja 13.3.1989'an de kuşt."

Ger gunehê nivîskarekî tenê ev tişt be û li ser wê yekê bête kuştin, gelo sîcê vî gelê Kurd ê ku daxwaza serxwebûn û yekîtiya neteweyî dike, wê çendî mezin be?

Dijmin Kurdan dikuje, lê belê wê roj were ku serfiraziya welatê me çavên gelê me dê ronî bike û dilê zehmetkêşên Kurdistanê ava bike.

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Dijminê mezin

Her dijmin ne yek e, hin ferq di navbera wan de hene. Hinek ji wan qelaş û sextekar in, hinek jî barbar û xwînxwar in, hinek ji dijminan jî mirov in, lê dîsa jî neyar in.

Di cîhanê de hemû dewletên dagirker û kolar ji gelên bîndest re dijmin û neyar in. Lê tu dijmin, heta îro weke dijminên gelê Kurd hov, barbar û xwînxwar nîn bûne û nabin jî. Ger dijmin medenî û mirov bin, dîsa rûmetek tî de heye. Çi bêsiûdiyeke mezin e ku dijminên gelê Kurd nemirov in, barbar û hov in.

Gotineke pêşyan heye dibêjin: "Ger mirov hêsîr (dîl) be jî, bila hêsîrê mîran be; nêçîr be,

Ez dikarim vê jî bibêjim ku, ji wan hemûyan jî bo gelê Kurd dijminên mezin, beriya her kesî 'Erbakan' e, piştî wî 'Ecevit û Alpaslan' e, piştî wan jî Yilmaz û Sezgîn e, siwarê bozê jî bêzîn û dezgîn e. Îro xwe kerr dike, sibehê xwe dihejîne.

bila nêçîra şêran be". Lê sed mixabin, gelê Kurd nêçîra hov û haran e, dilê nemirov û sextekaran e. Gotin durist be "nêçîra tola ye, hêsîrê mola ye". Ez gelên Tirk, Ereb û Ecem jê

tenzîh dikim, vê rastiyê jî îzah bikim ku, bi hov û canewerên mîna Sedam, sextekar û qeşmerên mîna Erbakan, gur û wawikên mîna Ecevit û Alpaslan, bêdoz û bêsozên mîna Sezgîn û Süleyman re ne dostî tî kirin, ne jî dijminahî.

Dibêjin em birayê hev in, lê Kurd tune ne. Em demokrat in, lê her tişt yê me ye. Em ku we dikujin dibin "ewliya", hûn me bikujin dibin "eşqiya". Me welatê we parçe kiriye, lê hûn veqetînxwar in. Em li we zilm û zorê dikin, lê hûn neheq û tewandar in. Bi kurtî çawa ku Sadiyê Şîrazî jî gotiye "Bi dijminên cilq û çewt re nayê îdarekirin û derbasî nabe. "Ez çi bibêjim; qehra Xwedê li neheq û zaliman were, bela xwe ji ber lingên xwe bibînin.

Ez dikarim vê jî bibêjim ku, ji wan hemûyan jî bo gelê Kurd dijminên mezin, beriya her kesî 'Erbakan' e, piştî wî 'Ecevit û Alpaslan' e, piştî wan jî Yilmaz û Sezgîn e, siwarê bozê jî bêzîn û dezgîn e. Îro xwe kerr dike, sibehê xwe dihejîne.

Çima em dibêjin Erbakan dijminê mezin û xedar e? Lewre xapînok û sextekar e. Bi navê dîn, dijminê dîn e, bi navê biratiya îslamê Kurdan dixapîne, doza Tûranî bi dîn dimeşîne. Ji kemalîstan bêhtir dijminê Kurdan e, ji panturkîstan çêtir cewrê guran e. Doza wî seltenet e, qoza wî mel'enet e. Bi kurtî yobaz û sextekar e, tolebaz û har e, bi lêp û fend e, dijminê kêmfersend e.

Piştî te du salên bêrîkirinê

Nîjad Yaruk

Kek Wedat: ev bû du sal ku em ji hev dûr in, ev bû du sal ku xaka nîştiman te di hembêza xwe de vedişêre, ev bû du sal ku bi sedhezaran birayên te Amed kirin bajarê serhildanê û tu şandin nava refên pakrewanan. Ew pakrewanên ku weke te di riya welatekî serbixwe de serî danibûn.

Gelo tu di dîlana çend pakrewanî de amade bûyî? Te çend ji birayên xwe bi destên xwe binax kiribûn? Te çend ji şehîdan, ji devê çeqel û rawiran derxistibûn û li ser piştî xwe ji çiyayên bilind daxistibûn. Hate bîra te? Beriya kuştina te, bi çend mehan 9 têkoşer li çiyayekî nêzî Amedê şehîd ketibûn û leşkerên dewleta Romê ew li ber devê çeqel û rawiran hiştibûn. Tu û çend hevalên xwe hilkişîn wî çiyayê bilind, we şehîdên xwe li piştî xwe kir û ew laşên wan ên pîroz, li gor tore û adetên civaka me binax kir.

Baş e: tu zanî ku çend ji birayên te, hatibûn dîlana te. Te bi çavên xwe dît, seriyek konvoya erebeyên ku hatibûn laşê te yê pîroz bînin, li Madenê bû, seriyê din jî li Amedê. Cade û kolanên Amedê êdî mirovan ranedigirtin, ji çar aliyên welatê te yê pîroz qefle bi qefle mirov hildikişîn Amedê. Dijmin rê û dirban girtibû. Bi hezaran mirov li derî bajêr bêgav mabûn, nikaribûn xwe bigihînin dîlana te. Ên ku ketibûne bajêr jî di kolanên de dor li wan hatibû pêçan.

Tevî hemû rêlibergirtinan bi dehhezaran xwişk û birayên te li cihê mitîngê li benda te bûn. Ji dengê sloganên erd û asîman dilerizîn. Dû re tu anîn. Girsyên gel tabûta te li ser milên xwe derxistin rê. Gel ji du milan ve ber bi goristanê ve vedikişî. Dijmin, bêgav mabû û


ji ber vê bêgaviya xwe meşvanan gullebaran kirin û du xort şehîd ketin. Tabûta te daneket erdê, dîsa bi tililî, dîsa bi dîlan li ser milê gel ber bi goristanê ve dimeşiya.

Li ser gora te birayên te axaftinên gelek girîng dikirin, mesaj didan dinyayê, dikotin: "Heta ku em hemû şehîd nekevin ev şer venamire". Dema Merşayê Reqîb dest pêkir, herkes ji piya bû. Gel bi yek dengê merşayê xwe xelas kir û tabûta te ya bi ala neteweyî ve xemilandi daxistin gorê. Dayika nîştiman, te ji destên lawên xwe girt û bi dilovanî tu hembêz kir.

Li ser riya vegeerê, dijmin di amadekariya qetlîamê de bû. Dor li nêzîkî 20 hezar mirovî girtibûn û ew gelên bêçek gullebaran dikirin. Tirsê dilê wan dibû gulle û bi ser xwişk û birayên te ve dibariya. Di vê qirkirinê de 9 kes ji birayên te şehîd ketin û bilez xwe gihandin te. Bi sedan jî birîndar hebûn. Dijmin careke din barbariya xwe nîşanî dinyayê da. Lê dîlana te bû serhildaneke pîrr mezin û di dîroka Kurdistanê de, di nava rûpelên zêrîn de cihê xwe girt.

Belê Kekê Wedat. Bi dû te re jî qetlîamên kontr-gerîla domiyên. Di nava du salan de zêdeyî 500 kesî bûn qurbana vî şerê qirêjî. Lê têkoşîna rizgariya neteweyî her çû xurttir bû. Dijmin wilo bawer dikir ku, ger we bikuje, dê agirê şoreşê vemirîne. Lê ev baweriya dijmin di nava van du salan de têk çû. Îro, şerekî diwartir li ser xaka nîştiman didome. Serkevtin her roj hinekî din nêzîk dibe. Û piştî du salan em dibînin ku dijmin nikaribûye te ji me veqetîne. Tu bi giyana xwe, bi baweriya xwe di nava me de yî û ji her demî zindîtir î.

Bi silavên germîn û bi hêviya hevdi-tinê, bimîne di xweşiyê de birayê delal.



Wedat Aydin di hemû şahî û şînen hemwelatîyên xwe de, cih digirt. Ew di zanebûna berpirsiyariyên xwe de bû û ji ber vê yekê hatiye kuştin.


XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zîlanî

Çeperast: 1-Yek ji kurên Mîr Bedirxan e. Navê wî yê pêşîn Xelîl e. Ji damezrevanê Hêvî û Cemiyeta Tealî ya Kurd e û ji serokên Xoybûnê ye. Di wêne de tê dîtin
2-Kesê ku tiştan diafirîne/ Nijadeke Îndo-Ewrûpî 3-Siyasî/ Movikên pêçiyar 4-Desthilat/ Cejn, îd/ Kûp 5-Rih/ Îstîsna/ Kinnivîsîna 'gram' 6-Înad/ Jan 7-Sewaleke bi kêr/ Eziyet 8-Balkişandin/ Durûtî 9-Tek/ Sembola Fransîûmê 10-Rejîma qraliyê.

Serejêr: 1-Hilperikîn 2-Berhem 3-Sewaleke kojker/ Navenda belavkirina Elektrîkê 4-Kinnivîsîna rêxistina ku ji bo rizgariya Îrlanda li hember Îngiltere têdikoşe/ Rawêj 5-Fîlozof, zanyar/ Ji Misra qedîm navê yezdanek 6-Cepheya cengê 7-Daçekeke paşgir/ Kinnivîsîna 'doktor'/ Nesîl 8-Nîjad/ Bazirganî 9-Dapîtin 10-Pênûs 11-Pez 12-Aletê ku pê tentene tê çêkirin.

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12



BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ

Çeperast: 1-Leyla Zana/ Em 2-Ecnebî/ Aramî 3-Hek/ Oran/ Xem 4-El/ Erebi/ Kawa 5-Alîkarî/ Îr 6-Gevez/ Na 7-Mason 8-Kêr/ Nêz 9-Înan 10-Siyonîzm.

Serejêr: 1-Leheng/ Kîs 2-Ecel/ Erênî 3-YNK/ Av/ Ray 4-Le/ Elem/ No 5-Aborîzan 6-Zîrek/ Sêwî 7-Abanoz 8-Nan/ Ran/ Am 9-Ar/ Kî 10-Axa 11-E-mewî 12-Mîmar.

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmarê pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Li Tirkîyê: 385393

Ji kerema xwe re vî cihê dagirin û tevî kopiyekê pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Kadırga Liman cad. No.92

Eminönü 34490 İstanbul Tel: 518 25 28

Fax: 518 85 54

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

"Ev hikayeta han bi navê 'Şêr, Rovî û Keftar', yekî ji xelkê Diyarbekirî, li dora sala 1965'an li ser miletî mezlûm wek Kurdan û hilekarên zalim nivîsiye..."

Şêr û rovî bûn heval
Bi dil, can û rih û mal

Siyaset û mêranî
Wan nêzikî hev anî

Pirr bi hevdû şîrîn bûn
Herdu bi hev emîn bûn

Dane hevdû bext û soz
Bûne xwediyê heq û doz

Keftar ji cînarê wan
Bi her sêyan yek eywan

Dest û milan dane hev
Pê kar kirin roj û şev

Rovî dît keftar zane ye, got: "Wê bi hilên min bihese. Ew û şêr wê bibin yek min ji eywan derxînin. Lazim e ez wana ji hev biqetînim"

Şêr, Rovî û Keftar



Roviyê bêbext û hilekar
Şêr şande ba keftar

Got: "Qerara me ev e
Tu ji eywanê derve"

Keftar ji şêrî re got:
"Dijmin tu car nabe dost"

"Dijminê kal û bavan
Dibe dost ew bi lavan!?"

Oî û armanc û nîjad
Qewm û qebile û qad

Yê we herduyan ne yek e
Bi rovî bawer neke

Evê îro ku heye
Sibe li serê te ye"

Şêrê serhişk ê nezan
Dirêj kir çûyî eywan

Ew û keftar şerr kir
Keftar ji xanî der kir

Rovî jî pê re lêxist
Keftar serdev erdê xist

Keftar çû mal nexweş ket
Ji hêrsa pirr, felç lêket

Wê gavê wî danî dar
Bû bendekî stûxwar

Malê xwe tamam firot
Ji berikan heta pot

Jê re mabû yek baxçe
Fiyeta wê bîst axçe

Di gel çend hebek zevî
Di cih de hişt û revî

Keftar gelek pê zor hat
Rabû kir terka welat

Roviyê xayîn û şeytan
Li Ewrûpa kir îlan

Ez ketim herba dinê

Şêrê reş ma bi tenê

Bi serê xwe vî kir
Wî ev qetlîam çêkir

Ev zilma han li keftar
Ne ji me, ji şêrê har

Bi serê Osmaniya
Bêxeber im ji vî ya

Şêr û rovî bûn ortax
Baxçe kirin gul û bax

Şêr xebitî bi rastî
Rih û can xwe derxistî

Wê gotinên keftarê
Derve di biharê

Roviyê bêbext û soz
Xerabiyê kire doz.

"Rovî bixwe fikirî, ji xwe re
wiha got:
"Ev şêr ne ji qewmê min e
Karê wî ji me re tune

Baxçe bo min hindik e
Incax têrî min bike

Ya baş ji bo min ev e
Ew jî, ji vir derve"

Çavê wî jê nebiri
Tiştêk jê nediket serî

Got: "Bi min tenê nabe
Bi bav, xal û ape"

Rabû geriya dît heval
Bavê xwe, ap û xal

Got wan: "Em ên hevdu

Şêrê reşê pişt çûne

Eger fesal bibîne
Wê me ji vir derîne

Tedbîra xwe bibînin

Em wî ji baxçe derînin"

Dane hevdu sozê xwe
Şêr derxînin ji nav xwe

Rovî şande peyî Şêr
Şêr ji jorî hate jêr

Şêr hate nêzikî wan
Xweş nedî rûçikî wan

Silav da wan sekinî
Roviyê xayîn pê kenî

Rovî bûye şervane
Ji şêr re dît mahne

Pirsek ji vir, yek ji wir
Heta xwe lê kire gurr

Gote: Ev cihê min e
Tiştêk te tê de tune

Ê keftarî deranî
Ji baxçe û ji xanî

Ew ez bûm ne ku tu yî
Heta bibî tu xweyî

Ev cih bûye malê min
Qanûn vira dide min

Pîrsa ku ez dibêjim
Ji can û dil dibêjim

Qesem navê Xwedê kim
Ezê guhê te jêkim"

Pirr bi zora şêrî çû
Got; ez nadim te recû

Gote: Dizê şekalan
Xayîn ji bav û kalan

Gurê pîs ji Îranê
Te anî cihê hanê

Bi diziya mirîşkan
Postî mirar pisikan

Te îdara xwe dikir

Li ku bûyî xwediyê vir?

Rovî got: Tu feqîr î
Tu bêkes û hesîr î"

Şêr got; baxçeyê me ye
Ferqa min te tune ye

Gerçî ku ez bi kes im
Ji qewmê te re bes im"

Rovî got: "Xwe kerr ke
Apo dê te parçe ke!"

Şêr got; qewmê te çi ne?
Nizanim mêr ya jin e!

Rovî ba kir dergeven
Ap û xal hatin meydan

Got: "Ev qewmê min e
Ê te kesekî tune"

Şêr dît maye bi tenî
Gote Rovî "Ezbenî"

Şêr zanî hal xerab e
Bi Rovî re şer nabe

Rovî got: "Çewan î?"
Şêr got: "Mîr tu zanî"

Rovî got: "Şêr zalim e
Jê re terbiye lazim e"

Qewmê wî got: "Darda ke
Rovî got: îcab nake"

Belê heqê wî dar e
Welê ew xebatkar e

Rovî emrî apo kir
Guhê şêrê reş jêkir

Şêr sekinî neqedand
Çû mal guhê xwe kewand

Got: "Bêaqilîyê min e
Dinya tev mervê min e

Rovî bi fem min xapand

Ji pismamê min qetand

Îro bi qewm deke
Çi bixwaze wî dike"

Şêr tenê ma li malê
Ne bav, ap û xalê

Xwe avêt bextê rovî
Rû berda bûye sofî

Rovî jê te got: "kîro
Derewkero çilvîno

Here pezekî bine
Lê kes pê nehesîne"

Şêr rabû pezek anî
Li ber axê xwe danî

Axa pez ji hev xistî
Goşt xwar da şêrî hestî

Şêr hestî xwar bi giranî
Qîma xwe wî pê anî

Şêr xebitî bi dest û zend
Heqî şêr axê sitand

Şêr xebitî roj û şev
Mafê xwe da axê tev

Şêr rabû çû zewicî
Hestiyan kire du cih

Çendek wiha derbas kir
Heta hestî xelas kir

Paşî zarokên wan bûn
Kilfetên wan giran bûn

Ewladê wî mezin bûn
Tev mêr û zar û jin bûn

Şêr zêde bûn bûne pirr
Hestiyan têrî wan nekîr

Rovî çû hat roj û şev
Heta ew berdabûn hev

Bo hestiya şer danîn

Rabûn qira hev anîn

Paşî dîn, îş xerab e
Gotin: "Ev wiha nabe"

Şêran ji axayî Rovî re er-
zûhalekî nivîsandin

Paşî rabûn bûne yek
Nivîsandin kaxezek

Kaxezê wana ev bû;
Bi xwîn, zêr û zeber bû

Hestî ji me re hindik e
Serûpê îhsan bike

Dane destî dergevan
Rabû çû gote wan

Ji we daxwaziya wan
Serûpê jî bidin wan

Rovî li textî jor bû
Çav li serê wî sor bû

Îro doza serî ye
Sibe doza hemî ye

Qewmê min zêdetir e
Hestî ji wan re pirr e

Înadî bikine bazar
Dê herin riya keftar

**"Xwediyê vî hikayetî ku
Kûpfiros e, wiha dibêje:
Heta ku Şêr nezan bin
Serhêşk û guh giran bin**

Siyaseta dinyayî
Bijên kêrî me nayî

Mezinê xweyî bêhuner
Ji xwe re bixine rêber

Dijmin, dost û neyar
Nas nekin ew rast û xwar

Xwendî di gel nexwendî
Mela, axa û gundî

Keç, xort, kal û pîr
Cotkar, rêncber û mîr

Li ber agirî milî
Nerm nebin her wek şilî

Di nav hev de nehelin
Bi hevdu re nekêlin

Bi hev re tev nebin yek
Ji xwe daneynin serek

Ji ber roviyê fenek
Rezîl dibin yek bi yek

Te dît yekbûna rovî
Şêrê xist bîndestê wî

Rast e ev serhatiya han
Ji erd, heta ezman

Ji qelema Kûpfiros
Rijyabû hat bûye coş

Hezar rehmetî mezin
Li wî, hevalê wî bin

Rehmet li dê û bavan
Tev hurmet û silavan...

'Kurê Pîrî jî dê bibit Pîr'

Mazhar Günbat

Mîr Adil Nasir Hacî, ku wek mezinê Kurdên êzîdî yên Duhokê tê naskirin, di parlamentoya Kurdistanê Başûr de mebûs e. Parlamento wî mîna berpirsiyar û berdevkê Kurdên êzîdî qebûl kiriye. Mîr Adil Nasir li Duhokê rûdine. Bi mebesta ku em ji jêderên saxlem xwe li ser rewşa êzîdiyan bikin xwedî zanîn me ji devê Mîrê êzîdiyan Duhokê pirs-girêkên wan guhdarîkirin û em van gotinên balkêş derpeşî xwendevanên xwe dikin.

– Ez tiştekî bêjim te? Gelek rojnamevan hatine nik me ji bo hevpeyvînê. Bi rastî, em nizanin kî ne, bi navê kê tî û ji ber vê yekê em naxwazin bi wan re zêde bipeyivin.

Bes em dikarin teminatê bidin we ku em bi navê xwe û bi navê rojnameya xwe hatine vê derê da ku der heqê we, dîtînen we û şertên hûnê de dijîn de, bibin xwedî zanîn û agahdariyê bidin xwendevanên xwe.

– Êne, hemû kesên ku ji xwe re dibêjin rojnamevan, wisa dibêjin, lê em nizanin kîjan rast dibêje; kîjan ji wan ajan e, kî rojnamevan e.

Hûn ji istixbarata Sedam ditirsin an ji ya hikûmeta Kurdistanê Başûr?

– Na, na...Em ji ya vê derê natirsin. Tîrsa me ji Sedam e.

Baş e, em pirsên siyasî datînin aliyekî, ez dixwazim li ser adet û toreyên we çend pirsan bikim.

– De kerem bike.


Berî hevpeyvînê, we got ku di nav we de terîqetên dinî hene. Çi cihêrengî di navbera van terîqetan de hene? Yek serdestê yên din e an na?

– Na, na... Her yek ji wan bi serê xwe ye û ne serdestê hevûdin in. Çar terîqetên me hene: Mîr, Pîr, Şêx, Mîrîd.

Tê gotin ku, kesê ji terîqetê nikare bi kesekê ji terîqetê din re bizewice, ev ji ber çi ye? Ne ji ber serdestî û bindestîyê ye?

– Ev terîqet yên dinî ne. Her kesek pêwistiyên terîqeta xwe isfîmal dike. Şixul û peywirên wan ji hev cuda ne. Mesela, şixulên pîr, Mîr û yên din ji hev cuda ne. Mesela, Pîr nikare jinekê mahr bike. Selahiyeta mahrê di destê Şêx de ye. Şêx jin û mêran li hev mahr dike. Merasîmên me yên dinî di nav van terîqetan de teqîsînkirî ne.

Di gelek olan de terîqet an jî mezheb hene. Hebûna mezheb û terîqetan bi egeran tî îzah-



Mîr Adil Nasir Hacî

kirin. Di ola êzîdî de egerên hebûna van terîqetan, van veqetandinan çi nin?

– Te zanî çawa? Pîr Pîr e, Pîr kurê Pîrî ye, te zanî çawa? Çênabit ku Şêx bibit Pîr, Mîrîd bibit Pîr, meqset ez biçim bibime Pîr. Ew; bavê wî Pîr bû, ew jî dê bibit Pîr. Ji terîqeta Pîr, yê herî ixtiyar dibe Pîrê gişan, yên ji wê terîqetê, giş wêk Pîr tî bi navkirin. Ji bo terîqetên din jî eynî qeyde lê ye. Ew kesên ixtiyar, berpirsiyarên dinî ne û wêdebeyên dinî pêk tînin û didin pêkanin.

Pîştî serhildana gelê Kurdistanê Başûr ya li hember Sedam, di rewşa we de çi guherî?

– Zêde tiştek neguherî, bes tiştek heye. Em bûne du qisim, te zanî? Hindek man di bin destê hikûmeta Sedam de, em jî hatin gihîştine hikûmeta Kurdistanê Başûr.

Hûn di parlamentoya Kurdistanê de mebûs in. Ji bo başkirina rewşa gelê Kurd ê ji ola êzîdî, hûn çi pêşniyar û daxwazan pêşkêşî parlamentoyê dikin?

– Em difeşa vî milletî dikin. Ez mumesilê êzîdiya me, welew, feqet em difeşa gişan dikin.

Heta vêga we çi pirs-girêkên êzîdiyan anîne ziman û pêşkêşî parlamentoyê kirine?

– Îtîfaqa tebdîlên êzîdiyan di qanûna parlamentoyê de hate qebûl kirin. Di parlamentoya me de, ne tenê jî êzîdiyan; ji bo herkesî demokrasî durist e. Ji her ol û mezhebî re û ji hemû gelan re serbestî heye. Êzîdî, file, misilman û kesên ji olên din, giş wek-

hev in, mafê yekî ji yên din ne kêmtir e di parlamentoyê de. Mesela, Erebên ku li vir dijîn, xwedî hemû mafên xwe yên neteweyî ne. Ew, Kurd, Asûrî û yên din giş wekhev muemele dibînin û tî qebûl kirin.

Li ser hejmara êzîdiyan çi zanîna we heye? Li vir û li hemû dinyayî çiqas êzîdî hene?

Em dizanin ku li Iraqê sê sed hezar in. Ez nizanim hejmara gişan çiqas e. Bes ez dizanim ku êzîdî ji hev belavbûyî ne û li gelek welatan hene. Li Tirkîye, li Îranê, li Corciya, li Êrîvanê û li Ewropa êzîdiyên koçberkirî hene. Hin ji wan ol guhertine an jî dev ji êzîdîyê berdane.

Têkiliyên we û êzîdiyên Bakur bi hev re hene?

Helbet hene. Têkiliyên me bi yên Bakur, yên Corciya û yên deverên din re hene. Mesela vê sibehê, mêvanên me yên êzîdî yên ji Corciya li vir bûn.

Der heqê şertên jiyana wan de hûn çi dizanin?

Rewşa wan baş e. Wan mêvanên me digotin sê sed hezar êzîdî dijîn li Corciya û bi serbestî dikarin îbadeta xwe bikin. Jixwe hejmara wan li wê herêmê ji ya misilmanan zêdetir e. Ji ber vê yekê tu zîlm û zor jî li ser wan tune.

Tê xuyakirin ku, bi avabûna hikûmeta Kurdistanê Başûr, rewşa êzîdiyên vê derê ber bi başiyê ve diçe, gelo em dikarin bêjin ku ev der wê di pêş de bibê navend ji bo hemû Kurdên jî dinê êzîdî?

Ku Kurdên misilman mafên

me bi temamî bidin me, erê welle wê hemû bizivirin, û li vir cihwar bibin. Hûn zanin, bav ku bav e, gava zêde tadeyê bide kurê xwe, wê kur dev ji bav berde. Bi rastî, kesî wek Kurdên misilman tade nedaye me. Lê, me hê jî Kurdayetîya xwe ne hêlaye. Em dimînin heta domahîkê. Heke dîsa wek berê tade li ser tadeyê bidin me, em ê Kurdayetîyê jî bihêlin û ji vî welatî herin.

Hûn rewşa Kurdên êzîdî yên Ewropa çawa dibînin, wisa xuya dike ku dev ji adet û toreyên xwe berdane, ne wilo?

– Na, na! Sala 1990'ê, ez çar hevy li Almanya jî mam. Û min hemû êzîdiyên li wir ziyaret kirin. Min, di nav wan de, nedît ku yekî êzîdî bêje ez ne Kurd im. Êzîdî, ne ku Kurdîtiya xwe înkâr dikin, lê dibêjin ku ji destê Kurdên misilman pirr tade û zor kişandine, mecbûr mane welatê xwe hêlane û koç kirine nav welatên din, ji ber vê yekê jî gazinan dikin, lê kesê êzîdî nabêjin em ne Kurd in.

Yanî dema welat xweş be, wê tev bizivirin welat?

Erê wele welat xweş bit, wê bizivirin. Feqet, heger ji bo me ne xweş be, emê jî biçin, te zanî? Me ne gotiye bila heqekî zêde bidine me, bes divê mecalê jiyane jî me re hebe.

Der heqê xwendinê de hûn çi difikirin? Hûn zarokên xwe dişînin mektebê?

– Qiz, kur, biçûk, mezin em gişan didine xwendin. Ji zarokên me, kî dixwaze bibit çî, dibit.

Di olan de hin qeydeyên mutleq hene. Mesela di misil-

maniyê de kesekî misilman nikare dev ji misilmantiyê berde, dema yek dev ji misilmantiyê berdide mirtidê qebûl kirin û qetla wî wacibê tîtin. Di yahûdîtiyê de jî kes nikare dinê xwe biguherîne. Li cem we ev tişt çawa ye. Yekî(e) êzîdî dikare dinê xwe biguherîne?

– Kesê ku dev ji êzîdîyê berdide, jixwe berdide, lê bi rastî ku destê me bigêhê em nahêlin dev jê berde. Di halê hazir de çî mirovê dinê xwe nagre, em jî dibêjin wekî ew dinê xwe nagre, bila here, bi ku ve diçe bila here!

Êzîdiyekî(e) dev ji dinê xwe berdabe, hûn di nav xwe de wî(ê) careke din qebûl dikin, yanî ew kes dîsa dikare di nav we de, bi we re bijî?

– Yên çûn, na! Em careke din wan qebûl nakin, qetiyan! Tiştekî din jî heye, ji te re bêjim. Em qebûl nakin kes were bibit êzîdî jî. Heta îro gelek kes ji misilman, file an jî, ji olên din xwestine bibin êzîdî, bes me ew qebûl nekirine, em wan qebûl nakin. Dinê me vê qebûl nake. Em dibêjin yek însanekî bi kêrî dinê xwe neyê bi kêrî me û dinê me jî nayê. Misilman... Ne çênabe ez bêjim...

Na na, hûn serbest in her tiştî bêjin.

– Misilman weke girara gavanan in. Tu zanî girara gavanan çawa ye? Em gavanan digrin, yên ku têtin ber dewaran, vêca gavan her roj li nav gund digere ji bo xwarinê ji xwe re bide hev. Her malek texlîteke cihêreng didê, malûm e şîva her malê ne yek e. Vêca yek savarê didê, yek nîskê didê, yek birincê, yek tiştekî din. Ji van hemû texlîdan gavan dixê kodîka xwe. Vêca dinê we misilmanan wêk girara gavanan e. File be, êzîdî be, yahûdî be, kî dibe bila bibe gava were cem we hûn qebûl dikin. Ji ber vê yekê, em dibêjin misilmanî mîna girara gavanan e, ji ber ku herkesî dixê nêv xwe qebûl dike.

Vêga her ol xwe wek dinê herî baş û rasttirin qebûl dike. Li gor misilmanan tenê misilman, li gor fileyan jî tenê file diçin buhiştê, ji xeynî wan, hemû kesên ji olên din û yên bêol giş wê herin cehnemê. Li gor dinê we, parkirina buhişt û do-jehê çawa ye?

Rast e, herkes dinê xwe wek yê baştirin û xwe jî cenetî qebûl dike. Lê heqîqet, kesê emelê wî salih diçe buhiştê. Dema emelê yekî salih be, file, êzîdî, misilman an jî yahûdî; ji kîjan dinî dibe bila bibe, wê here buhiştê, ku emelê wî ne salih be û Xwedê jê ne razî be, naçe buhiştê.



- Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87
- Berpirsiyariya Ewropa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.